

K.T.
ZANÎ GEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZÎNDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BÎLÎND



ZÎMANÊ RAGEHANDINÊ
DI NUÇEYÊN ROJNAME ELEKTRONÎK DE

SAMAD OTHMAN QADER

14950001087

ŞÊWIRMEND

Alk. Doç.Dr. VECİHI SÖNMEZ

WAN- 2017

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ



KİTLE İLETİŞİM ARAÇLAR DİLİ
ELEKTRONİK GAZETE VE SYFALAR HABERİNDE

SAMAD OTHMAN QADER

14950001087

DANIŞMAN

Alk. Doç.Dr. VECİHI SÖNMEZ

VAN -2017



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ danışmanlığında, Samad Othman Qader QADER tarafından hazırlanan “Zimanê Ragehandinê Dî Nuçeyên Rojnameyên Elektroni De” adlı bu çalışma, 21/08/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

22/08/2017
Prof. Dr. Murat DİVÂNİ
Enstitü Müdürü

NAVEROK

MIJAR	RÛPEL
KURTE	V
ÖZET	VI
ABSTRACT	VII
PÊŞGOTIN	VIII
KURTKIRIN	X
1. DESPÊK	1
1.1 Têgehê Ragehandina Elektronîk	1
1.1.1. Dahatî Ya Rojnamegerîya Çap kirî	2
1.1.2. Egerên Baladesty Rojnamegerîya Elektronîk	2
1.1.3. Egerên Mana Rojnamegerîya Çap kirî	3
1.1.4. Aliyên Xirab yên Rojnamegerîya Elektronîk	4
1.2. Zimanê Ragehandinê	4
1.2.1. Ziman û Pirosêsa Peywendî kirinê	4
1.2.2. Curên Peywendî kirinê	5
1.2.3. Astên Peywendîkirinê	5
1.2.3.1. Peywendîkirna Xwedî (Intrapersonal Communication)	5
1.2.3.2. Peywendîkirna Kesî (Interpersonal Communication)	6
1.2.3.3. Peywendîkirna Navendî (Media Communication)	6
1.2.3.4. Peywendîkirna Cemawerî (Mass Media Communication)	6
1.3. Nûçe	7
1.3.1. Têgeh û Pênasên Nûçey	7
1.3.2. Curên Nûçey	8
1.3.3. Dabeşkirina Curî	8
1.3.3.1. Nûçeya Sade	8
1.3.3.2. Nûçeya Aloz	8
1.3.3.3. Nûçeya Taybet	9
1.3.4. Dabeşkirina Coxrafi	9
1.3.4.1. Nûçeyên Navxo	9
1.3.4.2. Nûçeyên Derekî	9
1.3.5.1. Borî	10
1.3.5.2. Berdewam	10
1.3.5.3. Dahatî	10

1.3.5.3.1.	Nûçeyên Pêşbînî Kirî	10
1.3.5.3.2.	Nûçeyên Pêşbînî Nekirî (ji Nişkekêve)	10
1.4.	Ziman û Pêwendiyên Cemawerî	12
1.4.1.	Ragehandin û Têgehê wê	13
1.4.2.	Erkên Ragehandin	14
1.4.2.1.	Nûçe Gehandin	14
1.4.2.2.	Demokrasî	14
1.4.2.3.	Rewşenbîrî	14
1.4.2.4.	Dem Borandin	14
1.4.2.5.	Şengistên Civakî	14
1.4.2.6.	Rêklam û Bangese	15
1.5.	Alavên Ragehandinê	15
1.5.1.	Ragehandina Çapbûyî (Ya Xwandî)	15
1.5.2.	Ragehandina Bihîstî	15
1.5.3.	Ragehandina Têdîtî (Visual)	16
1.6.	Giringtirîn Saxletên Gelemperî yên Zimanê Ragehandinê	16
1.6.1.	Zelalî û Sadeyî	16
1.6.2.	Hevçerxî	16
1.6.3.	Guncayî	17
1.6.4.	Balkêş	17
1.6.5.	Êkonomî (Aborî)	17
1.6.6.	Nermî	17
1.6.7.	Berfirehî	18
1.6.8.	Guncay ji bo Werarê	18
1.7.	Jêderên Zimanê Ragehandinê	18
1.7.1.	Zimanê Standard	18
1.7.2.	Zimanê Giştî	19
1.7.3.	Wergêran	19
2.	Morfolojî di Nûçeyên Rojnameyên Elektronîk de	20
2.1.	Peyv û Morfîm	20
2.1.1.	Morfîm	20
2.1.2.	Peyv	21
2.1.3.	Peyvên Zêde	23
2.1.4.	Peyvên Diyar	26

2.1.5.	Ew Peyvên di Bingehî da Nekurdîn.....	27
2.1.6.	Îdyem, Mîtafor, Xastin û Ladan.....	29
2.1.7.	Ekronîm.....	31
3.	Ristesazî di Nûçeyên Rojnameyên Elektronîk de.....	33
3.1.	Cor û Pêkhênên Ristê.....	33
3.1.1.	Pênasên Ristê.....	34
3.1.1.1.	Kereste yên Sereke.....	34
3.1.1.2.	Kereste yên Nesereke.....	35
3.1.2.	Curên Frêzan.....	35
3.1.2.1.	Frêza Navî.....	35
3.1.2.1.1.	Hevalnavê çewanî.....	36
3.1.2.1.2.	Hejmara Pileyî.....	36
3.1.2.1.3.	Cînavê Kesî yê Xweser.....	36
3.1.2.1.4.	Çawig.....	37
3.1.2.1.5.	Cînavê Nişane.....	37
3.1.2.1.6.	Cînavê Pirs.....	37
3.1.2.2.	Frêza Karî.....	37
3.1.2.3.	Hevalkar.....	38
3.1.2.4.	Frêza Hevalkarî.....	39
3.1.2.5.	Frêza Bend.....	39
3.1.3.	Curên Bikeran.....	40
3.1.3.1.	Bikerê RêZimanî.....	40
3.1.3.2.	Bikerê Lojîkî.....	40
3.1.3.3.	Biker Diyar.....	40
3.1.3.4.	Biker Nediya.....	41
3.1.3.5.	Biker Nediya Amaje Pêkirî.....	41
3.1.4.	Berkar.....	41
3.1.4.1.	Berkarê Rastewxwe.....	41
3.1.4.1.1.	Frêza Navî ya Sade ya Nawik.....	41
3.1.4.1.2.	Frêza Navî ya Sade ya Berfreh kirî.....	42
3.1.4.1.3.	Frêza Navî ya Lêkday.....	42
3.1.4.2.	Berkarê Nerastewxwe (Tewawkerê bi Yarîde).....	42
3.1.5.	Serbar.....	42
3.1.6.	Temamker.....	43

3.1.6.1.	Nûçe Gehandin	43
3.1.6.2.	Ristên Pirs	43
3.1.6.3.	Ristên Daxazî	44
3.1.6.4.	Ristên Mendehoşyê	44
3.1.6.5.	Riste ji Layê Ronanêve	44
3.1.6.5.1.	Ristên Sade	44
3.1.6.5.2.	Ristên Aloz	44
3.1.6.5.3.	Ristên Lêkday	44
3.1.6.5.3.1.	Ristên Sereke	45
3.1.6.5.4.	Ristên Şûnkeftî	45
	Rênmayî yên Nivîsîn ji Bo Malperên Elektronîk	46
	Rojnamevanî	46
	ENCAM	50
	ÇAVKANÎ	52
	JIYANNME	56

KURTE

Ev lêkolîn bi navnîşana (Zimanê Ragehandinê di Nuçeyên Rojname û Malperên Elektronîk de) li ser bingehê rêbaza wesfî ya şirovekarî hatye pêrewkirin, li gor zimanvanya pîraktîkî û çewanya bandorên zimanî li ser ragehandina elektronîk dinav malperên nûçeyên elektronîk hatye behskirin. Ev lêkolîn ji pêşgotin û sê pişkan pêktêt û li dûmahyê de encamên wê hatîne behskirin,

Pişka êkê

ziman û têgehê ragehandinê: navnîşana êkem pişka vê vekolînêye, mîna diyardeka girng di jyana civakî de behsa zimanî dike, ku peywendî kirin êke ji erkên wî yên sereke û têda behsa wî prosêsî û şêwe û regezên wî hatye kirin. herwesa behsa rojnameyên elektronîk û saxletên wî rojnamey û tora peywendî kirin ji rêya înternête re û curên rojnameyên elektronîk hatye kirin. Herwesa corên rojnameyên elektronîk ji alyê peyv û ristên babetên nûçey hatîne xuya kirin.

Pişka dwê

Morfolojîya zimanê Kurdî/Diyalêkta Navîn di nûçeyên rojname û malperên elektronîk de: ku ji (peyv û morfîman) pêktêt. Peyvên zimanê Kurdî ji alyê bingehî ve mîna peyvên asayî (zelal)ya peyvên zêde, peyvên hilwişyay, peyvên nenyas û biyanî û peyvên kronîm, îdyem hatîne behskirin, ji bo her êk ji wan nimûne û şirove ji bo hatye kirin. li gor morfolojîya zimanê kurdî/ Diyalêkta Navîn hatye xuya kirin.

Pişka sêyê

Sîntaksa zimanê Kurdî/ Diyalêkta Navîn di nûçeyên rojname û malperên elektronîk: ev pişke jî pêktêt ji (rêkeftin dinav zimanî de, rêkeftin û zimanê ragehandinê, rêkeftina biker û kar di zimanê ragehandinê de) û curên ristê (rista sade, rista aloz, rista lêkday, firêz, rista firêzê zêde) ku her êk ji van babetên serî mînak ji bo wan hatye xuya kirin û hatîne şirove kirin.

ÖZET

Bu yazı, çevrimiçi gazetelerde, dil açıklamalarına ve dilin çevrimiçi haberi nasıl etkilendiğine göre medya dili ile ilgilidir.

Bu araştırma üç bölümden oluşmaktadır. Birincisi (Kitle İletişim Araçlar Dili Elektronik Gazete ve Syfalar Haberinde) Bu bölüm, dili toplumdaki iletişimin önemli bir bileşeni, dil görgü kuralları ve dil aksanları olarak inceliyor. Ayrıca çevrimiçi olarak hazırlanan gazeteleri, bunların internet üzerindeki önemini ve iletişim ağlarını, farklı çevrimiçi gazetelerin tiplerini, kelime ve cümleleri haberlerde incelemektedir.

İkinci bölüm: Kürtçe sözcükler; Online haberde (kelimeler ve anlamlar) oluşan Sorani aksanı. Günlük dilde kullanılan Kürtçe sözler genellikle basit ve anlaşılır. Buna ek olarak, dil anlatımları; Ekstra kelimeler, bağlantılı kelimeler, uygun olmayan kelimeler, yabancı dilden türetilmiş kelimeler, kısaltmalar veya deyimler gibi konuların iyi açıklanması ve her biri için Kürtçe Kur'an aksanında örnekler bulunmaktadır.

Üçüncü Bölüm: Soran aksanındaki çevrimiçi haberlerde Kürtçe hapis cezaları. Öncelikle, bu bölüm ilk dil bileşeni, medya dili bileşenleri, medya dilinde konu ve eylem ve ikincisi cümleler türünden oluşur; Basit cümleler, karmaşık cümleler, bağlantılı cümleler, cümle cümleleri. Yukarıda belirtilen konuların her biri örneklerle açıklanmaktadır.

ABSTRACT

This paper is about media language in the online newspapers on the basis of language description and how the usage of language affects online news.

This research consists of three parts. The first part is (The Mass Media Language of Electronic newspapers and websites' News). This part examines the language as an important component of communication in the society, language etiquette, and language accents. Also it examines çevrimiçi based newspapers and their importance and communication networks on internet and different types of online newspapers, and their usage of words, and sentences in the news.

Part two: Kurdish wordings, for example; the Sorani accent in the online news which consists of (words and meanings). The Kurdish words used in everyday language are usually simple and understandable. In addition, language wordings; like extra words, linked words, inappropriate words, words derived from foreign languages, acronym words, or idioms are well explained and there are examples for each one of them in the Kurdish Sorani accent.

Part Three: Kurdish sentences in the online news in the Sorani accent. Firstly, this part consists of first language component, media language components, subject and action in media language, and secondly, types of sentences, for example; simple sentences, complicated sentences, linked sentences, phrase sentences. Each one of the above mentioned topics are explained with examples.

PÊŞGOTIN

Zimanê ragehandin û rojnamenivêsi mîna babeteke xweser û berfreh heta niho weke pêdivî vekolîn li ser nehatîye kirin zêdebarî wê çendê ku pêdivyeye giring ya ziman û rojnamenivêsi ya Kurdîye. Armanca vê tîzê kirina wan valatyên girêday bi zimanîve û haydarî kirina rojnamenivêsen Kurde ji hinek şengistên zimanê rojnamenivêsi ku heta niho pîte pê nehatye dan. Nûçe jî regezekê giring yê meydana rojnamenivêsiye û ziman jî alaveka pir çalake, lewma divêt hunerên darêtinê di xizmeta vê biyavê rojnamenivêsi da be ku pêdivî haydar bûnêye ji yasa û qanûnên wî zimanî ku babeta xwe pê darêjit. Êk ji şengistên herî diyar ya rojnamenivêsi kûrtbirî û sade û sakarya nivîsandinê ye. Nûçe jî bi hemî curên xwe ve pêdivî bi vê şewaza zimanî heye, daku wergir anku xwandevan bi sanahî têbighe.

Merema Nivîsandina Tîzê

- 1- Kêm kirina şaşyên zimanvanî dinav tîkistê nûçeyên rojnameyên elektronîk de.
- 2- Danana çarçuveke zanistî û ekadîmî ji bo darêtina nûçeyan di rojnameyên elektronîk di.
- 3- Tevahiya dezgehên ragehandinê pişkek zimanvanî hebe û ev pişke cuda be ji pişka jêgirtina şaşyan. Derçûyên zimanê kurdî an kesên pişpor û xudan şyan kar têda bikin.
- 4- Guhdarya wan kesan bê kirin ku di pişka zimanvanî kar dikin.
- 5- Nebûna an kêmya jêderan bi zimanê kurdî diyalêkta Serî (kurmancî).
- 6- Arîşa zaravesazî di demê wergêranê ji zimanê Erebî û Îngilîzî û Kurdya Navîn ji bo Kurdya Serî.
- 7- Pêrew kirina tevahiya yasa û qanûnên rêzimanî ji alyê morfolojîy û sîntaks û watasazî ji cem rojnamenivîsan ve.

Metiryal û Rêbaza Tîzê

Ev vekolîn şengistên rêbaza wesfî şirovekarî û pîver û hinek aliyên piraktîkî şirovekirina zimanê nûçe tê pêrew kirin, ji rwangeha zanistê civakî, çewanya bandorên ragehandina rojname û malperên elektronîk hatye xuya kirin

Arîşa Têzê

Pêktêt ji kar kirin li ser zimanê ragehandin di nûçeyên rojname û malperên elektronîk ji astên morfolojîyê û sîntaksê û destnîşan kirina bandorên baş û xirab li ser ziman.

Armanca Têzê

Xuya kirina zanistiyê zimanî. Herwesa şêwaza bikarînan di biyavên piraktîkî û tîyorî ya zimanê ragehandinê di nûçeyên rojnameyên elektronîk de û bandorên wê li ser zimanê giştî û xuya kirina rola zimanî.

Di dawî de Ez pir spasiya xwdê dilovan dikim ku alîkariya min kir ji bo temam kirina vê tîzê, herwesa ez spasiya Dr. Wecî dikim ku erkê serpereştîya tîzê li stûyê xwe girt, wek erkeki pîroz bi min re westiya. Ez hêvî dikim temenê wî dirêj be ji bo xizmetkirina zimanê kurdî. herweha Ez pir spasiya malbata xwe û hemî wan kesên qedr gran dikim ku bi her regekî alîkariya min kirin, Bi rastî ez çî jî jê re binivîsim nahiye bilindî û rêzdariya wan.

KURTKIRIN

J	:	Jimare
R	:	Rûpel
W	:	Wergêr
Ç	:	Çap
T	:	Tabî'e
TER	:	Terceme
S.L.X.	:	Silavên Xudê Lê Bin
F.N	:	Firêza Navî
F.K	:	Firêza Karî



1. DESPÊK

Zimanê ragehandinê di nûçeyên rojname û malperên elektronîk de girngya xwe hey di werara kiltûrî û ferhengî de. Çê dibe ji alyekê cuda ve ji wê zimanî lêkolîn bê kirin. Lê weke pêdivî behsa van bandoran nehatye kirin, ku li ser zimanê kurdî/ diyalêkta navîn ya hey. Lewma hilbjartina vî babetî pêkulyeke ji bo dest danana ser girngya vî babetî. Eve jî ji bo wê çendê dizivre daku ev vekolîn bibe zanistî û ekadîmî, bi wergirtina mînakên êkser ji nûçe mîna kerestekê sereke ya kar kirina ragehandina rojname û malperên elektronîk û çewanya bikarînana zimanyê dinav vê çarçuvê de û malper û rojnameyên elektronîk şengisteke diyarîkirî tûneye ji bo darêtina nûçe ku digel saxletên ragehandina rojnameyên elektronîk biguncît û daxazî ya xwandevanî bîne rojevê. Jiber hindê bi gelemperî dinav nivîsîna de şêwazeke diyarîkirî pêgirî pê nahête kirin. Gelek caran biker û kirdar hind jêk dûr dikevin ku dibe egerê alozî û şêlatî anku kirdarên lêkday pirt pirt dikin û herdû pişkên wê jêk cuda diken û çendîn kereste dikene dinavbera wan de.

Herwesa berçav wergirtin dinavbera kes û jimare da, mîna sadetirîn şengista zimanvanî dikevine şaşyan ve, eve jî şêlatî li cem xwandevanî çêdike û nizane bikerê vî kirdarî kete an kom. Weke ya diyar di nivîsandina nûçeyan de bi gelemperî karê take neborî biker diyar bikar têt, lê nivîserên nûçeya rojnameyên elektronîkên Kurdî gelek caran dikevine hemberî şaşyan ji alyê dem û kes û karê de şaşyên zimanvanî bi eşkera pê dihasin, gelek pîte bi karê biker diyar nadin an di êk nûçeyda herdû corên bikeran bikar tînin.

1.1 Têgehê Ragehandina Elektronîk

“Têgehê ragehandina elektronîk paşî werara berçav ya internêta û belav bûna bilez ya wê teknolojyayê li cîhanê û bikarînana wê mîna navendeke pexş, rêjeya xwandevanên rojnameyên çap kirî kêm bû. Ji bo êkem car jî sala 1991 rojnameya (Şikago Rîbyon) kopyek ji rojnameyên çapkirîyên xwe xiste ser tora internêta bi navê Chicago Online. Piştî wî jî rojnameya (Hîrald Tribon) li sala 1993 ji bo êkem car li rêya malpereka internêta ve nûçe û agahiyên xwe belav kir, dîvra rojnameya (Washington Post) di sala 1994 hate dinav vê meydanê. Şarezayên biyavê ragehandinê di pêkulyeke tîr û berdewam dane daku pênase ke hûr û guncay ji bo vê curê ragehandinê bi danin, lê jiber berfrehya vê biyavê û fire aliyên wê ji pexş kirin û wergirtin û komkirin pêzanîna, wekirye nikaribe tinê pênasekê ji bo vê curê

ragehandinê bidanin, lê bi gelemperî rojnamegerî elektronîk: belavokeka elektronîk ya xulîya, ku pêzanînan li gor pirsên henûkeyî û bûyerên berdewam belav dike. Ku xwandevan bi rêya amêrên hişmend (Smart) ku bi internêtê hatye girêdan wan pêzanînan dixuîne. Eve jî modêleka nû daye ragehandinê û rojnameyan, ku pêdivye berdewam pêzanînan nû belav bikin û hevterîb digel rojnameyê çap kirî kar bikin, lê bi rengekê pexşê berdewam “(Mişo Koko, 2011, P.61) anku “Rojnamegerîya elektronîk Rojnamegerî yeka ya xwandî, ya bihîstî, ya meyzandî, lê wê Rûper nîne, ji rêya malper û pêgehên taybetiyên xwe li ser tora internêtê pêzanînan belav dike” (<https://www.eIjournalism.wordpress.com>) (Ebubekir Mohamed Babekir, Pêgey Rojnamewanî, 2014).

1.1.1. Dahatî Ya Rojnamegerîya Çap kirî

Li gor hinek ji şarezayan, çêdibe destpêka jinavçûna rojnamegerîya çapkirî destpêkiribe. Ew jî bi egerê dirustbûna wan hejmarên mezinên serdankerên malperên nûçeyan li ser tora internêtê û berawird kirina vê rêjê tîraja rojnameyan, ku zêdebarî wê çendê têçûna parey rojnamegerîya û malperên internêtê gelek kêmtire bi berawird çapkirina rojname û kovar û çapemenyên din. Nizî salekî berî niho rojnama (Kirîstyan Saynis Monîter) bi rengekî êk carî biraya rawestandina çapkirina rojnama xwe de, ew jî piştî wê çendê ku tîraja rojnama wî ji 1 milyon ve hate xwar ji bo 200 hizar leban ji rojekê de. Rêveberiya vê rojname di wê baweriyê de bû ku hind bese tinê dinav internêtê belav be, çunkî rêjê serdankerên malperê wan 1 milyon derbaz kir, herwesa rojnama lîmondê Ferensî bi heman awa gehîştin nizî îflasa êkonomî bûnê rêjê deyna wan gehiştê 150 milyon êro, eve di demekî de ev rojname serkeftineke mezin bi des xwe ve anîbû, bitaybet jî dinav wan neteweyên zimanê ferensî bikar tînin. Kêmbûna xwendevanan û zêde bûna amîreyên elektronîk mîna mobaîla hişyar (Smart) û amîreyên destî yên mîna (Tablet û iPad), herwesa belav bûna ya bilez ya internêtê di van salên dawiyê de, hokareke sereke ye ji bo baladestbûna ragehandina elektronîk bi ser ragehandina Dîtyî.

1.1.2. Egerên Baladestya Rojnamegerîya Elektronîk

- 1- *Îternêt şyaneke zêdetir da rojnamegerîyê, bi taybet jî di pêşkêşkirina tîkist, wêne, deng û reng, di êk demda (Cross Medya)*
- 2- *Dirustkirina bester liser ew tîkist û peyvên ku pêdivî zelal kirina zêdetir heye û çêdibe ji xwandevanî re zelal nebe (Hyper Link)*

- 3- Gelek caran digel nûçeyan de, hinek nûçeyên giring û girêday heman babetî tîn dîtin.
- 4- Ragehandina elektronîk neyê sînordare û digihe tevahiya cihan.
- 5- Kêmya têçûna parey ji kirîn û pişikdaryê kirin li hember bidesketina rojnameyên elektronîk.
- 6- Ji ber ku herdem bûyer û nûkirina pêzanînan li ser înternêtê, bi dirêjahîya 24 demjimêran wekirye xwandevan nikaribe çaverêya rojnamekê bike ku rojê êk car tê çapkirin.
- 7- Bi sanahî şaşî tê çapkirin û dúbare tîn belavkirin.
- 8- Sanahî di gehandina pêzanînan bi awayeke bilez. Anku rojnamegerîya çapkirî bi vê çendê ranagehe ku nûçeyan zû bi zû belav bike û bihayê demî ji dest dide.
- 9- Hilgirtin û înanewa pêzanînan, hilgirtina pir tirîn pêzanîna û hebûna erşîvxane û pertûkxana elektronîk.
- 10- Rojnamegerîya elektronîk berovajî rojnamegerîya çapkirî azadî pitir têda hene û bi xurtî dikeve bin çavdêrî û sansorê.
- 11- Rojnamegerîya elektronîk bi wê çendê tê cudakirin ku kartêkirina wî digel wergiran de zêdetir û bileztire. Niho xwandevan tinê bi wergirtina nûçeyan nahête razî kirin, belkî ew jî nerîna xwe li ser bûyeran dinvîse.
- 12- Dúbare belavkirina babetên rojnamevanîyê di torên civakî û akawntê bikarhîneran di torên civakî de mîna (Facebook, twitter, my space, linked in, tango, google+...)
- 13- Sanahîya geryan li dîv pêzanînan ji rêya hebûna alavên geryanê (Search Engine)
- 14- Di rojnamegerîya çapkirî de, herdem arîşa nebûna rûberan hene û divêt abûrîya peyvan bîn ji ber çavwergirtin, daku kêmtirîn cihan bigre, eve jî dibe sedemê wê çendê ku pêzanîn weke pêdivî negehe xwendevanan. Lê ev arîşe di rojnama elektronîk de tûneye.
Hebûna blogan ku rojane di şyan daye bê beramber pêzanîn liser binivîsin.
- 15- Hebûna blogan ku rojane di şyan daye bê beramber pêzanîn liser binivîsin.
(Ebubekir Mohamed Babekir, Pêgey Rojnamewanî, 2014).

1.1.3. Egerên Mana Rojnamegerîya Çap kirî

- 1- Parastina bê alîbûn û pîte dan bi aliyên îtîkî ya rojnamevanîyê.
- 2- Kesên xudan şyan û şareza di biyavê rojnamevanîyê kar têda dikin.
- 3- Belavkirin û pîte dan bi rojnamevanîya dîv çûnê.
- 4- Pîte dan bi aliyê zimanvanî, ku dibe hokarek ji bo zêdetir pêşveçûnên zimanî.
- 5- Kompanya pîteka mezin didin rojnamegerîyê çapkirî, bi ciddî dizanin ji bo belavkirina rêklamên xwe.
- 6- Nebûna plan û nezelalya dahatû ya rojnamegerîya elektronîk, berovajî rojnamegerîya çapkirî, ku bi arasteyeke ya çespay da diçe. Zêdebarî guherînan cêgîrtire.
- 7- Ronahî danane ser ew babetên ku pêdivî dîvçûnên hûr tir hene û tekezî kirin li ser ew regezên nûçeyan ku di mêdyayên elektronîk de biyavê bersvdana wan tûneye û eşkera kirina aliyên dinav bûyeran de û xwandina ciddî tir ji bo bûyeran.

1.1.4. Aliyên Xirab yê Rojnamegerîya Elektronîk

- 1- Dest gehîştin bi nûçe û pêzanînan û tune bûna bawerî bi jêderê pêzanînan, mîna ku di rojnameyên çapkirî de hayê.
- 2- Bikarînan navnîşana azirîner ji bo bi destve înan mezin tirîn serdankeran (hemî tişt ji pêxemet kilîkekê) kontrolkirina rojnamegerîya elektronîk ji aliyê yasayî ve neyê sanahîye. Ev jî wekirye kêmtir giringî bi layenên îtîkî bê dayîn.
- 3- Siruştê karê rojnamegerîya elektronîk wekirye rê ji bo belav bûna gutgutka biketeve.
- 4- Lezîkirin ji belav kirinê mîna keçekye ku dû ser hebin gelek caran ji pêxemet berîkana rojnamevanîyê dikevîne şaşyên berçavê yasayî û zimanvanî.

1.2. Zimanê Ragehandinê

1.2.1. Ziman û Piroşesa Peywendî kirinê

“Peywendî kirin bi xuya tirîn erkên zimanî tê danan, di her civakekê diyarîkirî de mîna pêreweke dengî tê bikarînan, niv hevnerînek ya hey dinav zimanvanan de ku ziman (Language) sîstemekê (Systemic) diyarîkirî ya hêmayane (Signs), êk ji armancên sereke yê wê dabînkirina peywendyane (Communication)”
(Can Cibran Kirm, 1986, R.9) di vêreda peywendyên civakî merem ji tevahiya

şêwazên berkeftin û peywendîye, ku *"Peywendyên civakî disepîne û pêdivyên jiyân û grûpan dixwaze"* (Ehmed Mihemmed Elm'tuq, 1996, R.71)

"Li gor odeyê peywendyan ji bo peydabûna zimanê, ku ji aliyê (Reviser)êve hatye nîşan dan, ziman ji encamê ew hîsîtî ya mikum dirust dibe ku ji bo peywendî kirinê ji mirovan re hene" (Mihemmed Me'ruf Fetah, 2010, R18) ev çende jî piştî xwe bi wê viyana mirovî girê dide ku ji bo ji hevdû gehîştin û peywendî kirin û axaftinê ya hey. Li gor gotina Eristoy *"Mirov bûyîneke medenî divêt û di pêkhêneke civakî de jiyânê dike"* (Rehîm Surxî, 2008, R7) jiyân û durmandor jî pêdivî hokarekîne ku vê rolê cîbicî bike ev girngya zimanî jî bûye sedemê dirustbûna civaka mirovayetyê û çalakî jî daye karên wî, alîkariya mirovan kirye daku ji rêya wî re nerînên xwe bigehîne û herdem digel hevzimanên xwe di pêkghorînên peywendyan dabe û pêzanîna bide û werbigre, ji rêya zimanî re daxwazyên xwe yên cuda cuda bidest bixe.

1.2.2. Curên Peywendî kirinê

Peywendî kirin di piraniya pênase û watayên xwe, wata veguhastina nerîn û pêzanînan ji kesekî ji bo kesekê din û çenid curek heye, hinek ji wana peywendî bi demîve heye, hinek din jî peywendî bi astan ve heye, hinek din peywendya wan bi derbirînêve hene, piştî pêşveçûnên zanistî û teknolojyayê, têgehê peywendî kirinê jî pêşve çû û welêhat ku peywendyên niv netewî jî pişkek bin ji wê.

1.2.3. Astên Peywendîkirinê

1.2.3.1. Peywendîkirna Xwedî (Intrapersonal Communication)

Pêktêt ji pirosêsa peywendî kirinê ku dinav xwe da cih digre, anku evî şêwey ji peywendîkirinêye ku em ji xwe da encam didin, ew demên ku mirov ji xwe ra diaxive.

Eger em bînin bi hûrî ji xwe re bimeyzin, em hîsdikin, rojane çendîn caran evê curê peywendî kirinê bikardînin, ji bo nimûne: demê ku em loma xwe dikîn ka me ji bo çi ev kare kir? An me jo bo çi digel vêhe axaftin? An demê em xwe ji bo hev dîtinekê digel berpirsekê daku em arîşên xwe ji bo wî behs bikîn...

Evê curê peywendî kirinê ji aliyê bikarînan hêmayanve cudahî digel peywendî kirina kesan an kesî tûneye, jiber ku di herdû coran de heman hêmayên peywendî kirinê hene.

1.2.3.2. Peywendîkirna Kesî (Interpersonal Communication)

Pêk têt ji peywendî kirineke êkser, be peywendî kirineke beramber jî tê naskirin û bi rengekê rû bi rû dinavbera dû kesan de tê encamdan û mirov dikare her pênc hestan têda pişikdar bike û baştirîn curên peywendîkirinêye, jiber ku baştirîn hell ji bo peywedîkerî dirust dike daku bizane heta çî radekê peyama wî bandor li ser wergirî hebûye, paşî peywendîker dikare peyama xwe weke pêdivî rastveket û bi rengekî araste bike ku bandora wê û aliyên bawerî pêhînanê mikum tir bibe, ji bo nimûne axaftinkerek di kombunekê de an govendekê de demê ku guhdarên wî dîv gazî kirina wî diçin, ew jî dîv gazî kirina wan diçe, dikare bi deng û rûxsar û amaje û livîna xwe bandorê li ser wana çêke, di demekî de ev bandor di radyo re kêmbibe. Herwesa dema xwandina çapkiryan mîna: rojname, kêmbiye. Anku eve wê çendê digehîne ku herçende şewê kesî anku beramberî zêdetir mîna hokareke peywendî kirinê bikarhatye, şyana gehandina baştir dibe, ji aliyê baweriyê jî hijmareka zêdetir ji wergiran vedigire, lê rojnameyên elektronîk li hember têkistan wêne û video berhevî temam yên hene di gehandina peyama nûçeyan bi rengekî hinek ji nûçeyên malperên elektronîk tinê vîdyoye.

1.2.3.3. Peywendîkirna Navendî (Media Communication)

Jiber ku dikeve dinavbera dû curên peywendî kirinê, ku Peywendîkirna kesî yan rû bi rû û peywendî kirineke cemawerîye, lewma dibêjnê peywendî kirineke navendî. Evê curê ji peywendî kirinê Telephone û Talks û Radio û Radar û Internet vedigire û bi gelemperî pêşketina teknolojyayê bandoreke êkser li ser rojnameyên elektronîk ya danay, bi taybet jî bi rêya torên civakî mîna alaveka gehandina nûçeyan di rojnameyê elektronîk ra bi kêmtirîn dem da digehe xwandevanî.

1.2.3.4. Peywendîkirna Cemawerî (Mass Media Communication)

Ew curê peywendyane ku ji rêya hokarên cemawerî yên ragehandinê cîbicî dibe.

Hokarên peywendî kirina cemawerî (Mass Media), pêk têt ji wan hokarên ku şyana veguhastina peyamên cemawerî hene ji jêderî ve ji bo hijmareka zor ya xelkî, mîna rojname û malperên elektronîk û kovar û pertûk û sînema û radyo û TV.

Herwesa di pênasekê dî tir da ya hatî:

Pêktêt ji pexş kirina peyamên rastî û xeyalî ji bo hijmareka zora xelkî ku ji deverên cuda cuda belav bûyne û ji aliyê êkonomî û civakî û rewşenbîrî û ramyarî ji hevdû cudane.

Merem ji peyamên rastî, van koma nûçe û pêzanîn û rênmayîne ku derbarê bûyeranin rojname belav dikin û radyo û TV pexş dikin. Peyamên xeyalî jî pêk tên ji çîrok û nîşandan û sitran û gelek berhemê huner yên din, ku piştî xwe bi rastyê girê didin û ji wê derê wênên hunerî dirust dibin, çêdibe jî ev wêne hinek caran ji xeyalê ve bên darêtin.

Pêşveçûnên zanistî harfkarîya wan kesan kir ku bi karê peywendyên cemawerî radibin, daku di êk dem û cihên cuda pêwendî bi hijmareka zor ya xelkî bikin, lewma dikarin pêşveçûnên teknolojyayê bi êk ji hokarên herî giringên werar û pêşveçûnên hokarên pêwendiyên cemawerî bê naskirin.

1.3.Nûçe

1.3.1. Têgeh û Pênasên Nûçey

Nûçe bi êk ji giringtirîn şewazên nivîsandina rojnameyî û aliyê pîte pêdana xwandevanî tê naskirin, jiber hindê rojnameyên nûçey bi rojnameyên hevçerx tên naskirin.

Guherînen civakî û êkonomî û siyasî di dahatûyê de bi her regekî bin, pêşbîniya wê çendê nahête kirin ku rojek bihêt ew kes nemînin ku demên xwe ji bo zanîna bûyeran û veguhastina pêzanînan ji bo xelkê din dabîn dikir. Zêdebarî şirovekirneka guncay ji bo wata û naverokê van pêzanîna.

Rojane û bi berdewamî emê guhdarîya nûçeyan dikin û gelek bi sadeyî em werdigirîn û bê beha em wana heldisengînîn, bi kêmî ji wî dimeyzînin, bê haydarî ji wê çendê ku bihîstin û wergirtin û şirovekirina nûçeyan bi hemî curên xwe ve pişkeke sereke û giring di tevahiya warên jiyanê pêk dîne. Gehandina peyaman û veguhastina bûyeran her li destpêka peydabûna jiyanê ve mîna pêdivyeye berdewambûna jiyanê serhildaye û bandorê erê û nerê ya wan bi ser tevaya warên jiyanê ra hebûye.

Şareza bûn û nasîna mirovan ji nûçeyan, mîna civaka kevin ya miruvatîyê çênabe çû civakek bê hebûna peywendyan dinavbera endamên xwe, werarê biket. Pêkînan civakekê temam pêdivî sistemekê peywendîkirinê ya diyarî kirî ya hey.

Lewma mirov pêdivî bi gelek belgên tûneye ji bo selmandina girngya nûçey ji bo xelkî. Nûçe şêwazeke ji şêwazên peywendî kirinê dinav xelkî de.

1.3.2. Curên Nûçey

Herwekî di berê da me behsa çenid pênasekê cuda yên nûçeyên rojnamevanî kirî, ku her êk behsa nerînên xwdana wî pênasey dikir ji bo vî babetî û heta radekê ji hev cuda bûn, ji bo curên nûçeyan bi heman şêwe çend nerînek yên hey di dabeşkirin û varvartina wan, êk ji wan dabeşkirinan bi vî curê ya binye, ku li ser sê şengistan hatye dabeşkirin.

Şengista êkê: dabeşkirina curî, ku nûçeyên sade û aloz û taybet vedigire.

Şengista dwê: dabeşkirina coxrafi, ku nûçeyên navxo û derve vedigire.

Şengista sêyê: dabeşkirina demî, ku nûçeyên zivray û ji nişkekêve vedigire.

1.3.3. Dabeşkirina Curî

1.3.3.1. Nûçeya Sade

Evî curî kurteya nûçeyan jî dibêjnê ji bo amadekirin û şirovekirina wan pêkulyeke kêr pêdivêt, ku nûçeyên nexweşî, mirin, agir ber bûn, seqa, demê çûn û gehiştina balefire û şemendeferan, şano û sînemayê vedigire.

“Asmanî şarî Dihok lemroda samal debêt û legel bûnî çend pele hewrêk da pley germî pêşbînîkiraw (31) pley germî debêt” (Malperê. N. R. T)

Gelek caran têkistên van nûçeyan tê darêtin û ji bo çendîn carna tê bikarînan bi guherîneke kêr ji hejmarên pila germî, an hewr û samal, nîmçe hewr.

1.3.3.2. Nûçeya Aloz

Ev cure mîna nûçeyên berê nîne, belkî aloz tire, gelek caran pêdivî şirovekirinê, rojnamenivîs piştî xwe bi wan zanyariyan girê dide ku wî ya hey, mînakê vê curê nûçeyan pêktêt ji: gotûbêj û gotinên rojnamevanî û civakî û helkeftên taybet û dadgehîy û aliyên pêwendîdar bi karûbarên darayî.

Le prsenameyekda Newşîrwan Mistefa delêt *“Prsenameket pîrbû le hestî dilsozane û brayaney hemîşeyî berêztan beramber xwalêxoşbû û bnemale û xanewadekeman le xway gewre dawakarm ke êwe selamet û temen drêjbin”* (Malperê RÛDAW) di vêreda erkê rojnamevanîya elektronîk ewe ku bi kêmtirîn peyv kurteya

naveroka vî namey li dawiya navnîşana babetî bidane, daku sernca xwandevanî ji bo naveroka wî babetî rabikêşe.

1.3.3.3.Nûçeya Taybet

Pêktêt ji nûçeyên çenid pêzanînan ku têkilî hevdûne, armanca wî belavkirina agehdarî û gotarin ji bo meremeka diyarîkirî, herwesa ew babetên behsa pêşveçûnên civaka miruvatîyê dikin û wan pêzanînan bi xwe ve digrin ku mifayê bigehîne bilind kirina asta rewşenbîrîya xwandevanî.

“Dr. Geşbîn Kemal, pîzîşkî psporî pêst delêt tîşkî xor hokarî serekî nexoşyekanî pêste le wane drust bûnî pele û çirçî û şêrpencey pêst, dije xorîş baştrîn rêgeye bo xoparastin lêyan” (Malperê RÛDAW)

1.3.4. Dabeşkirina Coxrafî

1.3.4.1.Nûçeyên Navxo

Digel serhildana rojnaman de, bûyerên navxo babetên giring bûn, ku van bûyeran vedigire ku di navxweyî welatî de tê rojevê û nêzîk tirîn pişka rojnameye ji bo xwendevanan, jiber ku bûyer û arîşên xwendevanan bi xwe ve digire û bandorê li jiyana wan dike. Dinav rojnaman de pişka nûçeyên navxwe ji bo xwandevanî bi (Rojnameyê Biçûk) tê naskirin, jibe ku nûçeyên syasî, devera wî, êkonomî, rewşenbîrî, şano, werziş, huner, cejin û helkeftan bi xwe ve digire.

Evê beşê nûçeyan pêkulyê ji bo dirustkirina raya giştîya navçeyî dide, ew jî bi pîte dan bi bûyerên dinav êk welatî de, zêdebarî avirdaneve ji deng û nameyên welatyan û belavkirin û gehandina arîşên wan ji bo aliyê pêwendîdar, anku hinek caran ew bûyer ji dervey sînorê hatîne rûdan, lê ew babet pêwendiyêke êkser bi wî welatî ve heye, lewma bi nûçeyên navxo tên naskirin.

“Jimareyek mamosta le hewlêr dijî bryarêkî xwêndinî bala girdbûnewey narezayyan encamda bo ejmarkiridnî nimrey polî (12) y amadeyî beşêweyekî arezûmendane” (Malperê N.R.T.)

ku merem jê ewe ku givaştinên xwendekarane ji bo ser Wezareta xwandina bilind ji bo cîbicîkirina daxwazyên xwe.

1.3.4.2.Nûçeyên Derekî

Hemî wan pêkul yan vedigire ku behsa wan bûyeran dikin ku ji dervey welatê xwe tên rûdan û çû pêwendî bi vî welatî ve nîne, ku bi nûçeyên nêvdewletî tên naskirin, rojname û malperên elektronîk pêkulyê dikin ji rêya ajansên cuda cudayên dengubasan bi destve bînin, daku bi rengê babetî nîşan bidin û belav bikin, anku rojnameyên mezin ji rêya peyamnêran ji deverên cuda cudayên cîhanê nûçeyan bidestve bînin

“Netewe Yekgirtuwekan hoşdarî dawê lewey dû Leser sêy hawulatyanî parêzgakanî yemen le ser lêwarî brsêtî û qat qirî dan le (60%) y hemû danîştwanî yemen brsîn xorakî ew wlateş xerîke be tewawy heres dênêt” (Malperê N.R.T)

1.3.5. Dabeşkirina Demî

1.3.5.1. Borî

Ew bûyerin ku hatîne rûdan û encamên wan hatîne berçavkirin.

Merem ji wan nûçane ku di demên borî de hatîne rûdan û encamên wan jî di demên borî de hatye berçavkirin mîna kîmyabarna helepce.

1.3.5.2. Berdewam

Ew bûyerin ku destpêkirye, lê heta niho dûmahî nehatye.

Wan nûçeyan bi xwe ve digire ku encamderên wê rûdanê eşkere bûne, lê handerên pişt encamderên wê rûdanê neyê zelale.

1.3.5.3. Dahatî

Ew bûyerin ku di dahatî da tên encamdan, eve jî dû curin:

1.3.5.3.1. Nûçeyên Pêşbînî Kirî

Ew bûyerin ku rojnamenivîs berî bê rûdan pêzanîn derbarê wê hene û di bîrhatinên xwe de dinvîse û xwe ji bo wî amade diket, mîna nûçeyên kombûna perlemanî, dadgehkirin û brîkanên werzişî...

1.3.5.3.2. Nûçeyên Pêşbînî Nekirî (ji Nişkekêve)

Ew nûçene ku berî hingî mirov hay jê nîne û nizane ku tên rojevê an ne, pêşbîniya rûdana wan nahête kirin, mîna nûçeyên bûyerên siruştî, ketina balefiran, agir berbûn, helgirîsana şoreş û kudeta û pîveleriz ... ev cure ji nûçeyan, dibêjnê nûçeyên nû anku nûçeyên zindî.

1.3.6. Dabeşkirina din (1)

- Nûçeyên Syasî
- Ew nûçeyên saxletên miruvatyê hene.
- Nûçeyên tawanan.
- Nûçeyên edebî.
- Nûçeyên heme cur û cuda cuda.

1.3.7. Dabeşkirina din (2)

1. Li gor qebara wan:

- Nûçeyên kurt.
- Nûçeyên dirêj

2. Li gor jêdera wan:

- Nûçeyên
- Nûçeyên

3. Li gor babeta wan:

- Nûçeyên syasî.
- Nûçeyên êkonomî.
- Nûçeyên rewşenbîrî û hunerî.
- Nûçeyên werzişî.
- Nûçeyên zanistê civakî.
- Nûçeyên curawcur.

1.3.8. Dabeşkirina din (3)

1. Ji aliyê berhev kirinê ve:

- Nûçeyên berhev.
- Nûçeyên hatîne çêkirin.

2. Ji aliyê naverokê ve:

- Nûçeyên rîs.
- Nûçeyên şiroveyî.

3. Ji aliyê babetî ve:

- Nûçeyên babetî.
- Nûçeyên destkarî kirî.

4. Ji aliyê tamam û

5. netemamî ve:

- Nûçeyên bilez.
- Nûçeyên tamam.

1.4. Ziman û Pêwendiyên Cemawerî

“Ziman mîna diyardeka civakî, rengvedanê pêşveçûn û werara hizrî û têgehştin û rewşenbîrî ya siyasî û civakî ya mirovane, rêvebirê sereke ya karûbarê rojaneya xelkye, jiber ku digel çendîn biyavên jiyana mirovan di peywendyan daye û rolê xwe ya hey mîna ziman, rewşenbîrîya ziman û ragehandinê... anku ziman di hemî warên jiyana mirovî û civakî da tevgera sereke û ew rastî jî tê berçavan ku: mirov zimane” (Elî Nasir Kntane, 2009, R49).

“Ji vê nerînê ve û bi sernicdan ji alavên cuda cudayên ragehandinê, bi hemî ciyawazî yên xwe ve û zîvirîn ji bo çewanya tamam bûna vê prosêsê: em dibînin ku pêwendî bê ziman dinavbera axaftinkerî û wergirî da çênabe, alavên teknolojyayê ji rêya peyamekê nebe nikarin cîbicî bikin. di vêreda peyam alava pirosêsa pêwendî kirinêye. Anku ev (ziman) ku alava sereke ya peywendî kirinêye, bê wî pirosêsa peywendîkirinê bi wataya xweya sereke nahête rojevê” (Mihemed Cemîl Şilşil, 1968, R19).

“Di vêreda em digehîne wê encamê, ku zimanê alava peywendîkirinêye û alava pêkvegirêdana endamên civakîye û di biyavên cuda cuda kar dike. Lê renga ragehandin zêdetir ji her biyavekê girêday zimanî be, heta wê astê ku mîna têgeheke kilasîkî ji zimanî pêk têt” (Elî Nasir Kntane, 2009, R49).

“Naveroka babetên ragehandin û rewşenbîrîye û merem ji wê gehîştine bi aliyên veşartî yên xwandevan û guhdaran, piştî wî bandor xistina ser nerînê û pêkhênên rewşenbîrî û civakî” (Azad Remezan Elî, 2009, R110)

“Peywendîya cemawerî bi wataya arastekirina nûçey û pêzanîn û nerînan têt, bi armanca dirustkirina bandoran bi rengê ne êkser an bi alavên (Mass Media) ku bir rêya wan alavan nerînek bi zêdetirîn hejmarê wergiran bigehînin, ewên ku ji cihên dûr û cuda yên belav bûne mîna Rojname, Kovar, Radyo, TV û Sînema” (Mihemed Cemîl Şilşil, 1968, R17)

“Tevahiya pirosêsa peywendiyên cemawerî bi rêya zimanî birêve diçe, eşkiraye ku bê hebûna zimanî gelek zehmete alavên ragehandinê çû rolek hebe, peywendya dinavbera ziman û ragehandin peywendyeka organîke, ku tevahiya çalakiyên xwe birêve dibe û bi rêya wan nerînan xwe têda vediguhêze, ziman jî

nikare destberdarê alavên ragehandinê be jiber ku hemî alav û kerestên peywendîkirinên dinavbera tak û civakî da ku alîkariya zimanî dike ji bo werarê” (Azad Remezan Elî, 2009, R110).

Êk ji saxletên herî diyar ya tora înternêtê bandora wî ya bileze ji bo nûçe û gehandina peyamên tak û civak û dezgehane ji rêya torên civakî û malperên elektronîk. Bandora bilez ya rojnamên elektronîk jî metirsî li ser rojnamên elektronîk çêkirî bi egerê bilind bûna têçûna berhemhênan û dabeşkirina wê.

1.4.1. Ragehandin û Têgehê wê

“Êk ji astengên rûbirûyî karê peywendîkaran dibe, pêktêt ji têkilî bûna herdû têgehên (peywendîkirin û ragehandin) êye hinek caran sînorê zaravê ragehandinê hind berfreh dibe kû têgehê peywendîkirinê vedigire, hinek caran jî tinê taybet dibe bi ragehandinê ve” (Îmad Hessen Mekawî, 2006, R8)

“Digel wê têkilî û cudakirinê jî her êk saxletên xwe hene, peywendîkirin li ser dû rehendan kar dike, ku têkilî hevdû bûn û hevdû tamam dikin, êk ji wana erkê wî pîrosêsa veguhastina pêzanîn û nerîn û pêşhatane û ya din rehenda wî pêkvegîrdan û têkilbûne, ku xwe ji wergirtina karakirina ya din dibîne, ku (bê vê rehendê xelesa peywendîkirinê neya temame), lê ragehandin evê rehendê girêdanê bixweve nagire tekûtok nebe, nemerçe ji bo tamam bûna wê karê tinê li ser rehendê veguhastinê kar bike” (Hêmin Mecîd Hessen, 2008, R38)

“Ragehandin pişkeke ji peywendîkirinê û peywendîkirin tevgire, ragehandin ew pîrosêse ku bidesketina pêzanîneke giring ji aliyê hinardinkerî destpêdike ku hejî veguhastin û belav kirinêye” (Mihemed Casim Flhî, 2006, R3).

“Ragehandin berî her tiştêkî çêkirina peywendyane, ku kesek (an giropek) peyameka hey û divêt bigehîne kesek din an giropekê ew jî werdigre” (Can Cibran Kirm, 1986, R12) , an ev peywendîye arasteya cemawerekê berfreh tê kirin, bi ciyawazîyên xwe li astên rewşenbîrî û nerînanve ragehandin pêdivî bi veguhêzerekê nêvendgir heye ji bo pêzanînan an alavên din yên ragehandinê mîna rojname, kovar, film, radyo, TV û pirtûkan heye. *“Anku peywendyên cemawerî ji binert da peyamin, ji rêya alaveka ragehandinê digehe piraniya xelkî”* (Con R. Bîtner, 1986, 18).

“Ew rêya ku dikare nerînan bigehîne çendîn wergiran her alavek jî curekê taybet peyaman vediguhêze ku ji yên din cuda dike, xala hevpişk dinavbera wan da zimane, armanca wî jî pêktêt ji rewşenbîr kirin an nûçe gehandin an dem borandin.

Ragehandin şêwazeke ji şêwazên peywendyên cemawerî ku pirupagende, rêklam, fêrkirin, peywendyên giştî û tama hunerî vedigire. Zêdebarî ragehandin çenid alavek hene ji rêya wan ve digehe xelkî, ji wan alavan jî: rojname, çapemenî, radyo, TV û sînema, her alavek jî saxletên xwe” (Ebdulezîz Şerîf, 1987, R31)

Ji regezên sereke yê ragehandinê (Hinardinker, Wergir, Kenal) kenal ew alave ku ji rêya wî pêzanîn û nerî an nûçe tên belavkirin. Anku em dikarin bi vî rengî bidin nasîn: pêktêt ji gehandina peyaman (nûçe, pêzanînen dirust) ji hinardinkerî ji bo wergirî, ji rêya êk ji alavên ragehandinê.

1.4.2. Erkên Ragehandin

Piraniya vekoleran nerînen wan derbarê xuya kirina erkên ragehandinê wekheve:

1.4.2.1.Nûçe Gehandin

Wata veguhastin û dîvçûna bûyerên giring, bi rêya alavên gehandinê û rengvedanê wan bi ser civakî de eve jî mîna pişkek ji daxwazyên siruşt yê mirovan ji bo têgehştin û nasîna durmandora xwe û zanîna ew tiştên ji durmandora wî diqewimin.

1.4.2.2.Demokrasî

Êk ji erkên giringên alavên ragehandinê dêmokrasîye, ev çende jî bi pîverên welatî bixwe, ku çarçuvê berpirsyaretya takekesî berfreh dike ji dirustkirina biryara û rêvebirina kar û pêkghorînen nerînan û hizrkirin ji vedîtina çareserên aşityane ji bo arîşeyan.

1.4.2.3.Rewşenbîrî

Merem jê belavkirina pêzanîn û ezmûnên dahênanê ji kenalên ragehandinê ve.

1.4.2.4.Dem Borandin

Pexşkirina babet û pirogramên komîdî û bi girnjin ku pişkek ji demên betal yê xelkî tijî dikin bi merema dilxweş kirina xelkî.

1.4.2.5.Şengistên Civakî

Hevmil digel damezraweyên din yê mîna (malbat û civak) ji werara bingehê civakî dimeyzine bi rêya wan babet û pirogramên ew belav dikin û pêwendî bi takekesî û kesayetiyên ve hene.

1.4.2.6. Rêklam û Bangeşe

Rêklam ji bo wan kelûpelên nû dikin ku ji cem welatyan ya giringin, roleke mezin di warê bazirganîyê de dibîne demê ku bangeşê ji bo derfetên karî dikin û rêklam ji bo kêmkirin û zêdekirina eşkera dikin.

Digel vê çendî jî de çendîn erkên din jî hene ku hinek caran ragehandin rolê mamosta û simîyanê jî dibîne.

1.5. Alavên Ragehandinê

Ji aliyê şêwazên gehandina peyaman ji bo wergirî alavên ragehandinê ji bo sê curan tên dabeşkirin, ku her êk xudan saxletên xweye:

1.5.1. Ragehandina Çapbûyî (Ya Xwandî)

“Ew alavên ku peyvên nivêsandî ji bo wergiran vediguhêze û bi kevna tirîn alavên peywendî kirina cemawerî tê naskirin ku heta niho jî mana xwe ya parasitye” (Hêmin Mecîd Hessen, 2008, R82)

Hemî ew ragehandinên çapbûyî vedigire ku di demekê xuyakirî an neyê diyarî kirî tên çapkirin û navnîşaneka hey, bi gelemperî rojname û kovaran vedigire ku bi rengekî elektronîk jî belav dibe.

1.5.2. Ragehandina Bihîstî

Ew alave ku pişt bi derbirînên gotinan girêdide, mîna Radyoyê. Eve jî wî kirye giringtirîn alava peywendiyên cemawerî, êk ji giringtirîn saxletên wî ewe ku berbestê nexwandevanî derbaz kirye ku ragehandinê çapbûyî nikarî wê sînorê derbaz biket ku wergir tinê ji rêya hestê bihîstinê wan peyaman werdigre. Eve jî ji bilî wê çendê ku dikare rûberekê berfreh bixweve digre û sînoran derbaz bike, peyamên wan bi deng tîne araste kirin bêjer jî li gor naverok û meremên tekstê yarî bi awaz û ton û hêzên li ser peyvan dike û ji vê rêyê ra bandorê dirust dike.

1.5.3. Ragehandina Têdîtînî (Visual)

Di esas da ku ji bo gehandina peyamekê pişt bi deng û wêne û nivîsîn girêdide (anku bihîstî, Têdîtînî, ya xwandî di êk demda) mîna TV, sînema, înternêt.

1.6. Giringtirîn Saxletên Gelemerî yên Zimanê Ragehandinê

Cuda ji siruşt û saxletên her êk ji alavên ragehandinê, ku taybetmendî û pêdivya wan bi zimanekî heye daku xwe digel biguncînin ku bikare bi baştirîn şêwaz derbirînê ji hizrên xwe bike û peyama xwe bigehîne, çend saxleteka giştî hene ku pêdivye di zimanê ragehandinê de hebe, giringtirîn saxletên wan evene:

1.6.1. Zelalî û Sadeyî

“Ev dû saxlete diyartirîn sîmayên zimanê ragehandinêye, eve jî ji bo siruştê alavên ragehandinê û taybetmendiyên cemawerê wêne, jiber ku eger dinav alavên bihîstin û bînin da peyv û riste neya zelal bin guhdar û bîner ji peyaman ténagehin, careka din derfeta wan tûneye ku guhdarî an temaşeya wan bikin daku di naveroka wan piştrast bibin; ji bo piraniya vê guhdaryê êk care ewên bi xirabî tê guhdkirin an ténagehin ji dest diçe” (T.Y. Harding, 2006, R8)

“Jiber hindê pêdivye peyv û zarav û riste zelal bin daku armanca xwe bînin, pêkhênên cemawerîya alavên ragehandinê li astê rewşenbîrîya cuda cudane. Gotineke hey dibêje: sadeyî pênasekê karîkgere berev rewanbêjyê” (Ebdulstar Cewad, 1988, R12)

“Jiber ku di sadeyyê da merem zelaltir dibe; zimanê zelal û pûxtya ziman tēkilî hev nebin, em vê gotinê dibêjin ku dibêje: mercê sereke ya nivîsîna rojnamenivîsî, zanîna nivîsînêye bi awayeke dirust, anku zanîna yasayên zimanî bi hemî aliyên xwe ve” (Samî Zubyan, 2008, R346) li ser vî babetî (Enştayn) dibêje: hizr bihayê wê tûneye eger bi awayekê nehête derbirîn ku yên din jê ra tēbgehin.

1.6.2. Hevçerxî

Pêdivye peyv û riste û derbirînên zimanî hevçerx bin, ristên dirêj û peyvên biyanyê giran û nenaskirî û ristê aloz û neya hevçerx gelek guncay nîne ji bo ragehandinê, meger ji babetên gelek diyarî kirî û kawdaneka gelek sînordar be, jiber ku zimanê ragehandinê vê ketwarê nîşana me dide ku bûyer tēda diqewimin.

1.6.3. Guncayî

Anku ziman digel alava ragehandinê û cemawerê wê biguncît, ji bo nimûne: zimanê Radyoyê sirušta wê saloxdane û ji bo hestê bihîstinê tê hinartinê, lewma divêt peyvên wê ji bo guhê mirovan bê nivîsandin nek ji bo çavên wî ku di rojnaman tê bikarînan ku xwandevan ji texên civakî, perwerdeyî, aborî di cudane.

1.6.4. Balkêş

Peyvên wî bi rengekê zindî û balkêş û sanahî derbirînê ji babetan bikin û wana zelal bikin, bûyeran zindî bikin, jiber ku çû kesek tûneye bivêt babetekê bixwîne anku guhdarîya wê biket an bimeyzîne ku bi zimanekê hişk û dûr ji balkêşî û hest livandin be. Derbarê balkêşî û girngya wê (Liyo Tolstoy) derbarê romana Şer û Aşitîyê dibêje: *“Ez vê bûyerê behs nakim, belkî ez dê wî inme ber çavan û şirovekem, ez welêdikem ku kesên dinav babetî da ji min ra baxive lewma pêdivye ragehandinkar babet û bûyeran bixe dinav çarçuvê zindî û pêkulyê wê çendê biket livîna bikete dinav hemî regezên zimanî û bi awayeke wesa bikete ber çavan wergir wesa bifehme ku ew bûyer yê bi çavên xwe yê dîtî û bi hemî hestên xwe ve tê digehe ”* (Azad Remezan Elî, 2005, R33)

1.6.5. Êkonomî (Aborî)

Ev saxlete pêwendiya wê bi sirušt û alavên ragehandinê û cemawerê heye, ku şyana berdewamî û li bend bûna wan tûneye, jiber ku hejmara rûpelên rojnamey herçend be hejmara rûpelên wê yên diyarîkirîne û divêt ew qas ji bo wî bê nivîsîn, pirogramek herçend be babet ji wî zêdetirin. Lewma pêdivye bi kurtî bên derbirîn û êkonomî ji bikarînana peyv û ristan ra bê bikarînan. *“Di vêre jî da derbirîna givaştinên ristan û derbaz bûn ji derbirînên zêde, bi wataya êkonomî tê, piroşesa paşekaftkirina peyvyan bû bi regezekê sereke û erkê êkê ya hunerê nivîsînê. (Nebîl Hedad, 2002, R43) her jiber hindê kurtkirin û êkonomî ji pey û axaftnan we kirye ku em pêkulyê bikin peyvên zêde û neya pêdivî bikarneynin ”* (Derûn Ebdulrehman Salih, 2010, R20)

1.6.6. Nermî

Merem jê ewe ku zimaneke ku bi nermî şyana derbirînê ji bo hemî babetan hebe û ji bo hemî texên civakî biguncît û ji bo gelek curên babetan biguncît.

1.6.7. Berfirehî

Divêt hejmarên leban watayeka mezin û berfreh bin daku li astê pêdivyên cuda cudabin, zimanê ragehandinê jiber ku berdewam digel warên rewşenbîrîyên ji dervey xwe peywendyan digre û herû pêdivî wergêranêye û wergirtina zaravan bandoran dêxîte ser qebareya zimanî bi giştî û berfirehya wê.

1.6.8. Guncay ji bo Werarê

Eve jî saxleteka yê girêday bi ragehandinê ve, ku herdem di werarê daye, zimanê 10 sal berî niho cudaye ji 20 sal berî niho, ew zimanê ku niho tê bikarînan mîna ewa berî 5 salan nîne herçend kêr û kesî jî hebin, lê şiyana derbirîn û balkêşî gelek ji caran zêdetire, pişkek ji werara zimanê ragehandinê ji bo hûrî ya bikarînana wî dizivire, ragehandinên çalak ji giringî werar kirin û pîte pêdana gencîneya peyv û zarav û destewaje têdigezin ku çendê bi mifaye.

Digel hemî ew saxletên li serî hatin diyarkirin (Fillip Gayer) di wê baweriyê daye ku: *“Saxletên sereke yên nivîsîna rojnamevanî dirustî ya zimanyê, ku hinek nîşane hene ku evane: rênivîsa dirust, zanîna piraktîk kirina rêzimanî (Sîntaks û Morfolojî), hilbjartina peyvên guncay û xalwendîya guncay”* (Can Cibran kirm, 1986, R87).

1.7. Jêderên Zimanê Ragehandinê

“Van guncan û nermî yê ku di zimanê ragehandinê de heyê, ji bo piraniya jêderan vedigere, yê bûye sedemê nermî û hûrkarî di derbirîn û hevengî di nîşandanê de, ev çende jî alîkariya wê kirne daku bi mîfa û balkêş be mîna saxleteka sereke ya ragehandinê. Bi gelemperî sê jêderên sereke pêkve pişikdaryê di dirustkirin û werarê wê de dikin” (Ebdulstar Cewad, 1998, R16):

1.7.1. Zimanê Standard

Ne zimanekê xwesere, belkî diyalêkta zimanyê bi egerê hokareke an çend hokarekan saxletên werdigre û dibe standard; em dikarin bêjîne zimanekê Standard eger evan qonaxan derbaz bike:

- 1- *Hilbjartina êk ji şewazan, anku hilbjartina êk ji diyalêktên zimanekî weke bineret, weke norm.*
- 2- *Bi kodkirina vî şewazî heta vê radê ku cudahî di pileka kêmtir da be.*

3- *Berfreh kirina biyavên bikarîna evî zimanî, anku di biyavên zanistî, edebî, rojnamevanî û tiştên teknîkî bê bikarînan.*

4- *Pêşwazî kirina wê ji aliyê civakekê ve, anku civakek wî bikar bînin* (Ferhad Şakelî, 2011, R103).

Vekolerên ragehandinê şîretê li rojnamevan û nivîseran dikin zêdegavî ji bikarîna zimanê standard nekin, jiber ku gelek xwe girêdan bi zimanê standard wan eûbrûya şelatî ya watayê dike, eve jî digel saxletên zimanê ragehandinê naguncît.

1.7.2. Zimanê Giştî

“ *Merem jê ew zimane an ew diyalêkt û zarên zimanekê diyarkirî ne ku tevahiya xelkî wî bikardînin, ev ziman neya taybete bi xwdana karekê diyarkirî an biyavek ji biyavên pêzanînan ku dinav diyalêktên civakî da hene, hinek kes baweriya wan ewe ku zimaneke feqîrane ji aliyê peyv û şengist û pêkhate û şewazên wê bi kêr wê çendê nahêt bite zimanê zanist an huner an edeb, ew tiştên bi vî zimanî tîn cîbicîkirin tinê karê rojaneya bazar û cade û malêye*” (Azad Remezan Elî, 2005, R40) jiber hindê nabe rojnamevan eger gelek pêdivî nebin piştî xwe pê girê nedin.

1.7.3. Wergêran

Di vî serdemî da ku alavên peywendî kirinê bi ser hemî biyavên jiyane de zalin. Têkel bûna netewe û zimanan di cîhana înternêt û teknolojya û setellaytê da, wergirtin û wergêrana zarav û derbirîna rastyan çênabe bê piştguhavêtin, bi vê çendê jî wergêran bû pêdivyeye jiyana hevçerx. Piştguhavêtina zanist û teknolojya û wan peyv û zaravên ku digel xwe dînin bi wataya veqetyan ji jîyar û pêşveçûnên mirovayetyê têt. (Roman Cakopson) sê cur wergêran diyarkirye:

- 1- *Pêkghorîna nîşanên ziman di zimanekî de bi nîşanên din di heman ziman de.*
- 2- *Pêkghorîna nîşanên ziman di zimanekî de bi nîşanên zimanekê din.*
- 3- *Pêkghorîna nîşanên zimanî bi nîşanên neZimanî, mîna bikarîna wêne, reng, muzîk, dawetan ji bo derbirîna watayeka taybet* (Azad Remezan Elî, 2005, R46)

2. Morfolojî di Nûçeyên Rojnameyên Elektronîk de

2.1. Peyv û Morfîm

Morfolojî ji dû astan pêktêt ku (peyv û morfîm) in:

2.1.1. Morfîm

“Morfîm biçûk tirîn lebê watawara zimanyê ji fonîmekê an zêdetir pêktêt û rolek di rêzimanî da heyê. Bi gihorîn û jêbirna her fonîmekê an bi kerkirina wî wata û rolê xwe ya sereke ji dest diçe” (Wrya Umer Emîn, 2009, 114)

Morfîm *“Biçûkkirin yekeya pêkhêner peyvêye ku wata hebe an erkekê rêzimanî hebe, di pêkhênên peyvê da”* (Mehmûd Fehmî Hicaz, 1997, R90)

Keresteyên sereke ya nûçeyan malper û rojnameyên elektronîk ku firêz û riste di dawiyê de têkistê pêkdînin di meyzandina xwe da em dibînin piraniya caran hevalkar û bi kêmîve hevalnav tê bikarînan.

Derbarê curê morfîman *“zimanvanan gelek curên morfîman diyarkirye, lê ji hemya girîngtir cudakirina morfîmên Bend û Azade, morfîma bend dibêjne wan morfîman ku xweser nahêne bikarînan di ziman de û divêt digel kerestên din da bihên, mîna hemî pêşgir, paşgir û nêvgirekê: (ek, ê, in, e, bi, gelo (ew dar, evan daran), were, biçûba...) morfîma azad berevajî wê çendê dikare xweser û bêyî alîkariya keresteyên din di zimanî de bîn bikarînan, mîna: (ba, dar, cih, dest...)”* (Mihemmed Me’ruf Fetah, 2001, R89)

Herdû zimanvanên amerîkî (Bilug û Trager) derbarê pêkhênên morfîman dibêjin *“Her şewek ku nikaribe bê dabeşkirin ji bo parçeyên biçûk tir eve morfîme”* (Mehmûd Elsihran, 2008, R230)

Dabeşbûna morfîman ji darêtina têkistên nûçeyên rojnameyên elektronîk da saxletên xwe hayê, ku em dikarin divan xalan da kurt bikîn:

- 1- Piraniya caran seredera nûçeyan morfîmên xweserin.
- 2- Nivîserê nûçeyan pêkulyê dike ku mifa ji wan morfîman werbigre ku jê tîn dirustkirin daku navnîşana wê zêdetir ji wata û şirovekirinekê hilbigre. Eve jî bi merema serincrakêşana xwandevanî ji bo vekirina vê rûpelê û serdana malperan. Ku dibe egerê gelek xapandina xwandevanî jiber ku naveroka nûçey ji navnîşana wî dûre.
- 3- Morfîmên bend, bi taybet amrazên peywendî beşdariyeke çalak ya heye di dirustkirina firêza hevalkarê demî û cihî di destpêka nûçeyan de.

2.1.2. Peyv

Derbarê peyvan *“Giranî û alozî ya pêkhênên peyvan wesa kirye, ku karkirin ji bo destnîşankirin û diyarkirina aliyên cuda yên cuda û taybet neya sanahî be, her jiber hindê ku zimanvanan bi gelemperî hemî digel wê çenidêne ku daneyek sereke ya zimane, lê di pênasakirin û diyarkirina nîşane û saxletên wê hevdû nagirin û bi nerîn û boçûnên cuda ve di hewara vî babetî ve çûne û heta evroke jî berdewam kar têda têkîrin”* (Faroq Umer Sdîq, 2011, R11)

Peyv *“Maddekê bingehîye ku morfolojîy vekolînê li ser dike, di rastyê de giringtirîn yekê zimanye, jiber ku pêkhênên giringtirîn yekeya zimanye”* (Hatim Salih Elcamil, 1989, R57)

Weke çewa peyv giringtirîn yeka zimanye bi heman awa sereke tirîn yeka darêtina nûçeyane. Di vêreda em dikarin bêjin peywendya dinavbera peyv û rojname, malperên elektronîk peywendyeka dû sere, jiber ku torên civakî yên nûçeyan û rojnamên elektronîk bandoreke êkser li ser çespandin û nasîna peyvên zimanî yên nû hene ji bo nav ferhenga nivîsîna nû ya kurdî.

Ji aliyê giringî ve *“Girngya peyvan di wî demî da diyar dibe ku nerînek û kerestekê nû tê dinav jiyanê da, ji bo derbirîn û nasandina wî pêdivî peyveka din heyê daku derbirîne ji bikin”* (Taban Mihemed Hessen, 2008, R60)

Derbarê rolê peyvan di zimanî de, zimanvanê Înglîzî (Mîşêl A. Halliday) di wê baweriyê daye *“Piraniya xelkî zelal tirîn saxletên zimanî dizanin ku ji peyvan pêkhatiye, di herdû seranda valatî heye, dizanin peyvan binivîsin, yarî pê bikin û dinav ferhangan da li dîv bigeryên nemerce wê binyasin û wesfa wê bikin, lê demê ku em ji vê hûrtir binêrin, peyv dûre ji wê sadeyyê û zelalyê me pêşbînî dikir”* (Halliday, 2007, R15)

Peyvbazî û yarîkirin bi peyvên nûçeyan dinav rojname û malperên elektronîk berhevveka berçav ya hey, eve jî bi merema darêtina peyvên pûxt û balkêş, ku dûr be ji bikarîna drêjbirî û bêzarkirina xwandevanî, anku hunerê rewanbêjî û kurtbirî di nûçe û rojnamên elektronîk tîn bikarînan.

“Tokyo aramtrîn şarî cîhane: senterî lêkolînewey zanyarî abûrî asayîşî take kesî û çawdêrîkrdnî tendrustî û jêrxanî abûrî be hend wergirtuwe” (Malperê Xendan)

“Herçend peyv daneyek zimanî êkcar kevnar û belav û bernyase, heta niho pênaseka hûr û kûr û tamam nehatye xuya kirin, zanayekê mîna Malînofskî peyva dike daneyek xeyalî didane û baweriya wî tûneye bi wê çendê ku hebûnek di zimanî da hebe, peyv li dawiya peyvan li dîv hevdu tîn û çû tiştêkê dinavbera peyva ji bo me nahête diyarkirin” (Mihemmed Me’ruf Fetah, 2011, R.89)

Derbarê sînorê peyvan dinav zimanê kurdî de *“Destnîşankirina tixub sînor, anku çarçuvê peyvan di zimanê kurdî da, karekê ne hind bi sanahîye, jiber ku piraniya caran ew peyv çarçuvê werdigirin û em dikarin ristekê mîna (Min le ayndeda carêkî tir êwe debînimewe) ji peveka eke (detanbînimewe) xwe diyar bike”* (Ebdulwehab Xalid Musa, 2007, R42)

“Derbarê pêkînana peyvên nû (Faroq Umer Sdîq) di pirtûka (Ledaykbûny Wişe) evê hêlkariyê xuya kirye” (Faroq Umer Sdîq, 2011, R43-44)

Xwandevan jî weke pêdivî derfeta wan tûneye ku cudahî dinavbera peyvên weke hev bike û hizr ji pêkhênên aloz bike çêj ji wan werbigre, jiber hindê pêdivye peyvên jêgirtî li cem xwandevan ra naskirî bin, zelalî ji hilbijartina peyvan ra destpêdike.

“Ew peyvan bikarbîne ku hevnasîn digel guh û çavan da heyê, hinek peyv baş nahêne bihîstin û nahêne dîtin, dibine egerê xepsîn û mendehoşyê, eger te peyvek nivîsî tû nizanî dê çewa hête xwandin, jiber ku berî hingî tû naçar nebûy wê bixwînî. hinek mirovên zîrek hene êka din jêdigre ku hevnasîn digel guh û çavan da heyê, hinek peyv hene: di axaftinê da pir cudane li hember nivîsînê an xwendinê da” (Karolin Dyane Lewis, 1993, R176)

Di nivîsîn û xwendinê peyva (xwandingeh) tê bikarînan lê di axaftina rojane da peyva (Mekteb) tê bikarînan. Herwesa *“Ew peyvên asayî bikar neyne ku tû bi rengêkê taybet di axaftinê xwe da bikardînî, lê di bikarînanê da ne gelek belavin”* (Robert L., 2003, R84)

Jiber ku zimanê rojnaman divêt sade û sakar be û rewan be, piraniya tex û çînên civakî bi sanahî têbgehin anku dûr ji zimanekê aloz be. Di heman demda divêt ew peyv girêday zimanê nivîsînê be bi girêdan bi diyalêkta xwe an zimanê nivîserî.

Di zimanê kurdî da dû zimanên standarda nivîsînê me heye ew jî diyalêkta kurdy navîn û diyalêkta kurdy jorî, nivîser divêt zimanê nivîsînê berçav wergirî, ew têkistê tê darêtin divêt bihayê wê ya hunerî mîna pexşanekê edebî be.

2.1.3. Peyvên Zêde

Peyv pêkhênerê risteye, li gor ew peyvên di giramatîk da pê tê spardin cihê xwe digre, erkê cuda cuda jî dibîne. Nûçeyên rojname û malperên elektronîk ji peyv û ristan pêktêt, lê ewên pêwendî bi peyvan ve heyê û di têkistên nûçeyan da mîna yasayekêye, pêktêt ji jêbirna tevahiya ew peyvên ku bar giranî ji bo ristan ve û erkekê diyarîkirî û pêdivya wan tûneye.

Wesa baştire ew peyv bên bikarînan ku ji kêmtirîn birge pêktên, anku dinavbera dû peyvan da ku heman wata hene van peyv bên hilbijartin ku hejmara deng û birga wan kêmtirin. Vekolerekê emrîkî dibêje: *“Eger hejmarên birgên peyvên ristekê gehiştê 20 birgan, divêt bi jêbirna hinek hevalnav û kawdanên wî bê kurtkirin, hejmartina birgan jî bi vî rengî dibe:*

- *Ew peyvên ji êk birge pêktên, nimre ji bo wî nahête hejmartin. Mîna: Gul, Kur.*
- *Ew peyvên ji dû birgan pêktên, êk nimre ji bo wî tê hejmartin. Mîna: Azad, Bapîr.*
- *Ew peyvên ji sê birge pêktên, dû nimre ji bo wî tê hejmartin. Mîna: Melevan, Azadî.*

Eger hejmara birgên peyvekê ji sê leban zêdetir bû, fehim kirina wataya wê girantir dibe û nimrek zêdetir ji bo wî tê jimartin” (Seyd Mihemmed Elseyd, 1988, R206) wesa çêtire ku ew peyv bên jêbirin ku hejmara birgên wan gelek in.

Êk ji bandorên sadeyî û zelalî, pêktêt ji ladan û jêbirna hemî ew peyvên ku pêdivya wan tûneye û ladana wan ji wataya ristê kêmtir naket. (Erving Fang) bi vî rengî şîretê li rojnamevanan dike *“Eger peyveka diyarîkirî ya hey, wê jêbe”* (Ebdulstar Cewad, 2001, R106)

Ladana peyvên zêde bi ramana abûrî kirin têt, astê morfolojîyê êke ji wan astên ziman ku ji bo hilgirtina wize, êkonomî têda tê bikarînan, *“Êkonomî bandorê ji bo derbirin û mana peyvan çêdike”* (Faroq Mihemmed Sdîq, 2011) jiber ku kêmtir mezaxtin ne tinê girêday samanêye, belkî ziman jî mîna parey alava gihorîn û pêdivyên jyanêye *“Pare û ziman bi giringtirîn pêdivya sîstemên civakî tê danan, peyv –mîna pareya kaxez û kanzayî- biha û nirx nabe tinê wî demî nebe ku bikarhîner dikene amrazên serederî kirin, (Antwan D. Referral) di vê biyavê da berî şoreşa*

ferensî dibêje: peyv weke pare bihayê xwe yê diyarîkirî hebû, berî derbirînê ji hemî curên bihaya bike” (Floriyan Kulmas, 2000, R10)

Di ragehandinê jî da abûrî kirin digel wê çendê jî da hilgirtina wize û bidestvehîna demye “*(Îbrahîm Enîs) derbarê tiyora êkonomî dibêje: mirov di demê derbirîna dengên zimanî da, ji pêkulî kirinê da heza êkonomî ya hey û sanahî tirîn rê jêdigre, digel gehîştin digel wê armanca ku ya hey. Ew jî derxistina watayan û gehîştin bi wan axaftinkerên ku digel wîne*” (Derûn Ebdulcebar Salih, 2010, R38)

Di nûçeyên rojname û malperên elektronîk da pêktêt ji negotina wan peyvên şelatî dirust dikin û erkeke diyarîkirî ya wan tûneye.

Peyvên zêde: Firêz, nav, karê zêde, hevalnav, hevalkar, peyvên rade û amrazên pêkvebestinê vedigre.

Derbarê bikarîna hevalnavan di nûçeyan da Dibêjin “*Nûçe jî mîna babetekê nivêsandî rêzkirina çend hevalnavekê, di sîstemê darêtina nûçeyên rojnamevanî da bi şewazeke lawaz tê naskirin*” (Azad Remezan Elî, 2005, R140)

Êk ji wan babetên gelek tekezî li ser tê kirin, ku nabe zêdegavî têda bê kirin, bikarîna hevalnavane di nûçeyan da.

(Karolina Dayana Lewis) di kitêba (Rûmalkirina Nûçeyan) da dibêje: “*Dûrbe ji hevalnav û başbêjî û ciwanbêjiya nepêdivî*” (Karolina Dayana Lewis, 1993, R179)

Di myana gotûbêja xwe da digel Belên Salih, parêzer Lence Xawê dibêje ku çênabe bêjin bi vê kempînê êdî hemî arîşên dinav torên civakî û bazirganî kirin bi wênên afretan ve dûmahî têt û namîne, dibêje ev kempîn pêngaveke destpêke û eger hemî van jinan rûbirûya van gefan bibin, dê bi awayekê wêrek berevanî jê dikin, weke dibêje “*Ez di wê baweriyê dame ku hêdî hêdî bi borîna demî ew arîşe tê çareser bûn*” (Malperê Dengê Emrîka)

Hevalnavê (hêdî hêdî) zêdehya zimanye, mîna kerestekê neyê sereke em dikarin ladeyn, ji ber ku helwsana watayî dirust dibe.

Nivîsîna hevalnavên nepêdivî digel wê çendê jî ku renga alîgirî pêve diyarbe pêdivye “*Zêdekirineka erênî be, ji bo ew navê ku tê saloxdan, nek wê giran bike*” (Ebdulstar Cewad, 1988, R35)

Jiber hindê pêdivye di nivîsîna nûçeyan da bi hûrî hevalnav were bikarînan. Gotinek jî heyê dibêje: “*Eger te viya peyvên te yên ciwan bin, hizra xwe bike ku çend hevalnavekan ladey, bê ku zerar bigehîte*” (Ebdulstar Cewad, 1988, R36)

Bumelerzeyek tirs û lertz û bîmî xiste nêw dilî xelkî şarewe em dikarin peyvên (lerz û bîmî) ladeyn bê ku bandorê li guherîna watayê nûçeyê bike.

Saloxdana kes û cih û bûyeran nîşana bê alîgirî û babetî bûnêye, rojnamevan ji bo berjewendiyên alîyekê naçar dibin evan peyvên bikarbînî, ku azirînerin. Gelek caran di nûçeyan da me guh ji peyvên (şehîd, terrorist, tawanbar, ciwan, zav, naşîrîn, gewre, berêz. . .) dibe, kî biryarê dide ku her êk ji van peyvên li hember kî tê bikarînan?

Herçende di nûçeyan da saloxdan bi temamî nehatye retkirin, lê ewên çênabe were piştguhavêtin ew saloxdanin ku wêne nikare derbibe, ji bo nimûne (bêhin) bi gelemperî saloxdana wê bi baş an xirab dikeve çarçuvê alîgirî ve û tê retkirin.

Hevalkar û hevalnav, di nûçeyên kurdî da bi awayeke zav tînan bikarînan, bê ku piraniya caran erkeke giring di tîkistê da hebe, rojnamevanê baş ewe çî caran demî bi vana nakujît, ku çî xizmetê bi nûçeyên wî nakin û dibine nîşana neşarezayî di nivîsînê da.

“Zimanê ragehandinê, dest ji hevalnav, hevalkarên cihî û demî, tîpa xistineser dibe” (Ebdulezîz Şerîf, 1987, 147)

“Malperê kurdîw wek karî hemîşey bedwadaçunêkî bo ew pirse kirid û le êstaşda çalakwanan û hawlatyanî parêzgay helebce dilxoşin ke M. Kamîl Ebidulqadir simbulî qurbanîdanî çekî kîmyayî helebce bebê beramber çareserî pêwîstî bo dekrêt” (Malperê kurdîw)

Di vê nûçey da nivîser destberdarê hevalkarê cihî ku cihê çareserîya welatyekêye li nexoşxana Faroq. Herwesa hevalkarê demî çareserî bûye, jiber ku ev nûçeyê ji encamê dîvçûna nûçekê dine û li cem xwandevan ya eşkereye, pêdivî bi dûbare navbirîna dem û cihê nake.

Ew peyvên derbirînê ji rade anku (Quantifier) dikin, di gelek tîkistên nûçeyan da bê ku pêdivî bin tînan bikarînan ji bo nasandina radey, di ferhenga rêberya Oxford ji bo rêzimana îngilîzî, hatye nivîsîn: *“Peyvên: zav, çendîn, hijmarek... vedigre”* (Jon Eastward, 2002, P219)

(L. G. Alexander) dibêje: *“Rade; peyvên mîna: kê, zav, çend vedigre. Çendêtiya van tiştan xuya dike ku em derbarê wê daxivin, çendêtiya navê dawiya xwe xuya dike”*(Jon .Estward.2002 .R 219) rade *“Zaravekê nûye li hember hevalkarê çendî an di hinek baran de li hember cînavê nediyar were bikarînan. Anku*

(hevalkarê çendî) dû zaravin ku ji bo hema tişt hatîne bikarînan” (L. G. Alexander, 1998, R66)

Hebûna peyv û amrazên zêde ji diyardeyên diyar yên darêtina nûçeyên malperên kurdîne, gelek caran hind peyv û amrazên zêde tên ber guhên me, temaşevanan serda diben, dibine egerê nezelaî û aloz kirina nûçey û negehandina meremên pêdivî, zêdebarî wê çendê ku saxletên pîrbêjî dide nûçey û xwandevanî bêzar dike.

Nimûne:

“Be gwêrey hewalêkî rojnamey hurîyetî turkî, barzanî bîryare kotayî em mange, serdanî turkya bika, be mebestî beşdarîkirdin le kongrey partî dad û geşepêdan AKP, ke bîryare rojî sî em mange berêwebîçê. Rojnamey hurîyetî turkî le hewalêkda ke dwênê bilawîkirdotewe, partî dad û geşepêdan bo beşdarbuwan le kongrey partekey dawetnamey rewaney jimareyekî zor le serkirde û serokî wilatanî cîhan kirduwe û lew çwarçêweyeşda dawetnameyekî rewaney barzanî kirawe, barzanîş le welamî dawetnamekey partî dad û geşepêdan raygeyanduwe, amadeye beşdarî kongreke bika. Her be gwêrey hewalî rojnameke, bo beşdarbuwanî le kongrey partî dad û geşepêdan be serokayetî receb teyb erdogan, ke bîryare sî em mange le turkya berêwebîçê, çendîn dawetname rewaney heryek le barak obama serokî wîlayete yekgirtuwekanî emrîka û encêla mêrkil rawêjkarî elmanya û firanswa oland serokî ferensa û beşêk le serkirdekanî wilatanî yekêtî eurupa û vladîmêr potin serokî rusya kirawe” (Malperê N.R.T)

Dûbare bûna peyv an navekê lêkday saxletê ev têkistê nûçeyê, navê (partî dad û geşepêdan) çar caran hatye dûbare kirin, eve jî di darêtina nûçeyan da neya pesende û bêzarîyê li cem xwandevan çê dike, Ekronîma partî dad û geşepêdan (AKP) were bikarînan an bêjin partî nawbiraw an partî dad.

2.1.4. Peyvên Diyar

Merem jê bikarînana ew peyv û zaravane ku neya naskiriîne û temaşevan bi sanahî jê têngahin û ne peyvên zindî yên rojanene, belkî peyvên dirustkirî yên nûne yên giranin an alozin an yên devereke diyarîkirîne, an ew peyvî ku giropek an texek diyarkirî bikardînin û digel derbirîne da temaşevan sernca wî biçe ji bo şirovekirin û hizrkirin ji wataya peyvê, di vê biyavê da wergir nûçey ji dest dide.

Jiber ku “Xelkî ku digel hev daxivin, derbirînen kurt û ristên netemam bikardînin, pêkulî nakin ku peyvên cuda bikarbînin” (T. Y. Harding, 2008, P10)

Li hember da, bikarîna peyvên naskirî ne kêşyane, belkî wêrekîye piraniya caran *“Rojnamevanên cehêl dikevîne davê bikarîna peyv û destwajên hevtemenên xwe, ku li cem piraniya guhdarên nûçeyan çû beha jêra tûneye, mîna zimanê civakê taybet”* (Mîlfin Mînsîr, 2008, R98)

Nimûne:

“Le beramber nebûnî awero û konkrêt nekiridnî kolanekanyan, jimareyek le hawlatyanî qezay koye girdbûneweyan kirid û ziyatir le katjmêrêk rêgay. . .”
(Malperê KNN)

(girdbûneweyan kirid) dû kare di êk demda (girdbûnewe) û (kirid) em çî caran di axaftinê da nabêjin (girdbûneweman kirid/ girdbûnewedekeyn/. . .) belkî (girdbûnewe) pêdivî bi karê yarîdeder nîne heta wataya xwe bigehîne lewma (girdbûneweyan kirid) ne karekê naskirye û pêkhatyekê nedruste, da bêjin (girdbûnewe)

2.1.5. Ew Peyvên di Bingehî da Nekurdîn

Bikarîna evan peyv, êke ji sîmayên diyar yên diyardeyên ragehandinê, rojnamevan jî bi egerê wergêran û wergirtina nûçeyan ji jêderên nekurdî naçar dibe evan peyv bi awayekê zav bikarbîne.

Rojnamevan, bi egerên guherînên bilez yên cihanê û dahênanên êk ji dawiya êk, pitir pêdivî peyv û zarav û derbirînên nû dibe.

Kor û damezraweyên taybet bi ziman jî, bilez peyv û zaravan berhem naynin, ku digel pêdivyên rojnamenivîsan biguncît, jiber hindê nûçegehyan naçar dibin peyv û zaravên zav yên biyanî bikarbînin, digel vê çendê jî da pêdivye karmendên pişka nûçeyên rojnameyên elektronîk bi taybet, bi hişyarî ve serederî digel peyv û zaravên nekurdî bikin, jiber ku karîger tirîn alavên ragehandinê bi ser xelkî ve. Eger peyvek an zaravek hat wergirtin û di zimanê kurdî da bermberê wê hebû, neya guncaye ku ewê kurdî were piştguhavêtin û ewê biyanî were bikarînan.

Digel vê çendê jî da hinek peyv hene, yên bûyn bi peyvên cihanî û nahêne piştguhavêtin û di hemî zimanan da bê cudahî tîn bikarînan. Mîna: (Television, Internet, Computer...)

Ew peyv û zaravên ku di bingehî da nekurdîne û di nivîsîn û gotinê da dikevîne bin yasayên fonolojî ya zimanê kurdî, jiber hindê divêt bi hişyarî ve serederî

digel were kirin, lê piraniya caran wergirtin û wergêrana peyv û zaravan li ser saxletên morfolojîya zimanê kurdî nahête kirin.

Erkê rojnamevanan ji wergirtin û darêtin û sazkirina peyv û zaravên nû roleka mezin yê hey di berfreh kirina ferhenga zimanê kudî da.

Bi gelemperî peyv û zaravên wergirtî bi sê şêwazan bandorê dike ser ferhenga zimanî, ku pêktêt ji: ya êkê-wergirtina peyvan mîna xwe. Ya dwê: wergêrana peyvan, ku dibêjnê (tiştên xav- claque) ji aliyê morfolojîve, ew peyv di zimanên biyanî da ya çewaye di zimanê kurdî jî da her wesa tê darêtin, her wê watayê jî dide mîna (Şerîq Elewset) bûye (Rojhelata Navîn). Ya sêyê-darêtin peyvên nû, wata peyva biyanî dibe pişkek ji peyva darêtî.

Nimûne:

“...qaymqamî mahşehir raygeyand agreke le layen tîmekanî agir kujênewewe kontrolkrawe û hîç xelexelêkî le karî kargeke drust nekiriduwe” (Malperê KNN)

- Peyva (raygeyand) wergêraneka deqawdeq ya peyva zimanekê dine, çunkî kurd di axaftinê da peyva (witî) bikardînin, lê eve cihê xwe girtye û mîna peyveka naskirî tê bikarînan, lê nemerce hemî deman were bikarînan.

- (tîmekan), (tîm) di bingehî da nekurdîye, lê ketiye bin bandorê morfolojîya zimanê kurdî û morfîma (-ekan) çûye ser û bûye bi peyveke kurdî. Çêdibe peyva (karmendan) ji şûna wê were bikarînan, herçend ev peyv cihê xwe girtye.

- Peyva (kontrolkrawe), wergirtina vê peyvê mîna xwe û paşî karê borî ya tamam (kirawe) ya wergirtî û bûye kurdî. çêdibe peyva kurdî (zalbûn)) ji şûna wê were bikarînan.

- (xelexelêk), peyveke mîna xwe ya hatî û amraza (-êk) ya wergirtî, ku wesa çêtire peyva (kêşe) ya kurdî were bikarînan.

Nimûne:

“Be pêy rêkewtinnamey sitratîjî Êraq û Emrîka, ke têyda cext krawetewe leser pabendbûnî Emrîka be parastinî dîmukrasîyet û fîdralîyet le Êraq da ke emeş giringî û ehmîyetî heye bo herê û berdewam bûnîşî leberay dîmukrasî û dije têror û geşey abûrî û çaksazî herêm ziyatir debestêtewe be stratîjîyetî Emrîkawe” (Malperê Gelî Kurdistan)

- (stratîjî) peyveka ya wergirtiye û mîna xwe hatye bikarînan.

- (dîmukrasîyet û fîdralîyet) dû peyvên wergirtîne bi yên hatine darêtin (dîmukrasî + yet) û (fîdralîy +yet) lê ew morfîmên beşdarin di darêtinê kurdî nînin, herdû peyv mîna dû têgehê nû yên hatîne nav zimanê kurdî ve û bi renegekê zav tîn bikarînan , para pitir bê paşgirê (- yet).

-(ehmîyet) bi darêtî (ehm +yet) ya hatye dinav zimanê kurdî ve û bikar têt, herçend liser astê nivîsînê da, zêdetir beramber kurdî tê bikarînan, weke çewa her di vê deqî da digel hev wataya xwe hatye.

- (dîmukrasî), peyveka ya wergirtiye û gelek naskirî weke têgehekê cîhan tê bikarînan.

- (dijetîror), peyveka lêkdaye, bi alîkariya amrazan (dij+e+tîror), li ser şengista zimanê kurdî hatye çêkirin, mîna (gulebax, şerekew...), lê di vêreda nîva dwê ya peyva lêkday (tîror) wergîraye.

- (stratîjîyet), mîna peyvên (dîmukrasîyet û fîdralîyet) e.

Çênabe bi hêceta têkistekê nûçey tinê ji zimanê kurdî ya petî peyvên nû werin çêkirin li beramber zaravên cîhanî yên di zimanî da. bikarînana peyv û zaravên biyanî ku di zimanê me da ya çespayne çû şerim tûneye, belkî nîşaneyê zengîn ya zimanê Kurdîye.

2.1.6. Îdyem, Mîtafor, Xastin û Ladan

Di nûçeyên rojname û malperên elektronîk da, dikarin mifayeka zav ji derbirînên Mîtafor, Îdyem, Xastin û Ladan were wergirtin, bi sedemê wekhevîyeka zav dinavbera Îdyem û Mîtaforî ve bê cudahî tîn bikarînan, derbarê peywendyên dinavbera van herdûka Kamîl Besîr dibêje *“Cudahî ya yekane dinavbera Xwaze û Xastin û Dirke, cudahya peywendyên dinavbera wataya êkê û wataya dwê peyv û derbirînan. Ji bilî vê cudahyê di bingehî da êkin û çû tiştek ji hevdû cuda naket”* (Şîlan Umer Husên, 2009, R70)

Digel wê çendê jî da bi gelemperî bikarînana îdyem di nûçeyên rojnameyê elektronîk da nexwende jiber ku *“Saxleta sereke ya îdyemê şelatî ya watayêye, jiber ku wataya wê nedarêtye”* (Şîlan Umer Husên, 2009, R70 - 73)

Ji wataya pêkhênerên pişkên wî nehatye, lê Mîtafor *“Ne hind şelatî têda hene ku têgehiştin ji wî giran be”* (Şîlan Umer Husên, 2009, R70 - 73) *“Gehandina watayê ji rêya wênaka awazê û darêtineke nû ve ku di mejyê wergirî da çê dike, eve jî*

bi temami digel pêdiviyên derbirînên telefizonê da digunce” (Ebdulstar Cewad, 2001, R208)

Bikarînana mîtaforê ciwanî û zelalî zêdetir dide bi van ristên ji bo nûçeyên rojnameyên elektronîk û telefizonê tîn nivîsîn, bikarînana gotinekê bi watayeka din, an ladan û xwastin ji dervey wataya heqîqya xwe bi sedemê wekhevî ya wan we li temaşevanan dike baştir û zû tir ji nûçeyan bigehe, ji bilî wê çendê ku sadeye û digel şengistên destpêkê yên nûçeyên rojname malperên elektronîk hevdû digrin.

“Boşayî asman ew şwêneye ke jyan têyda esteme û çendan karîgerî nerênî le ser cestey mirov cêdehêlêt û dway geraneweyan keştîwanekan dûçarî deyan girfîti cesteyî debnewe xwardnî keştîwanekan wek eweye hewîrî didan şordin bixoyt, çunke hemû le qtûnrawe” (Malperê K. N. N)

Di vêreda (hewîrî didan şordin) yê hatye xastin ji bo wê xwarina ku keştîvanên esmanî dixon, ku nerm û şil û tameka nexweş ya hey.

Bi gelemperî herçende her êk ji wana bi rêyên cuda tîn bikarînan, di tîkistên nûçeyên rojnameyên elektronîk yên kurdî da, digel wê saxleta ya guncay ku wan ya hey ji bo nivîsînê, mîna pêdivî mifa ji bikarînana Mîtafor an Xastin an Ladan nehatye wergirtin, an rêjeya bikarînana wan neya bilinde, digel wê çendê jî da çend mînakek tîn berçavan.

Nimûne:

“. . .Ta ew katey herdû proje yasay newt û xaz û dabeşkiridnî dahatî newtî fîdralî pesend dekrêt paşgez bûnewe û pêşêlkiridnî her birgeyekî ew rêkewtinnameye wata pêşêlkiridnî xalekanî rêkewtinnamekeye”(Malperê N.R.T)

- (pêşêlkiridn) bi watayeka din ya hatî li şûna wataya bingehîya xwe. Ku bi wataya cîbicînekirin û poşman bûn an danpêdanan nekirin bi wê rêkeftinê.

Nimûne:

“Barak obama le wtarekeyda raygeyand, helgîrsanî şorşekanî beharî erebî rûdawêkî giringe” (Malperê G.K)

Peyva (behar) ya hatye xastin ji bo nûbûna destelatan an nûbûn û ji nû darêtina sîstema destelatan di wan welatan da, ku berî wê serhildanê di qonaxa kilasîkîya birêvebirin jiyan kirinê da bûn, Bihar bi wataya helyana berfê û neweşyên zivistanê têt

- (helgîrsan) ku bi wataya hilkirina agirî têt. Merem jê destpêkirina şoreşêye.

Nimûne:

“Opozsyon bo çareser kiridnî pirsî danustan legel Bexda daway binema û ecêndayekî rûnî kirduwe, ke perlemanî Kurdistan wek gutarî neteweyî çawdêrî bikat, tenha lew haletêşda hemû layenekan qursayî qonaxî dahatû Leser şanyan heldegirin”
(Malperê Peyam)

Leser şan helgirin, bi ramana berpirsyarî û xem xwarin ji qonaxa dahatî têt, anku divêt ew bizanin erkên wan çine. (leser şanyan heldegirin) merem jê wergirtina berpirsyariye di dahatî da.

Nimûne:

“Bizutnewey hemas raygeyand, be tîror kiridnî (Ehmed ce'berî), dergakanî dozex be rûy Îsrayl dekatewe”(Malperê Spêde)

- (dergakanî dozex) wata gelek bi giranî bersiva Îsrayl didin.

“Hemû xelkî Kurdistan le Zaxowe ta Kifrî talawî em doxe nalebareyan be qurg da deçêt” (Malperê Spêde)

Merem jê nebûn û kêmya mûçe û xirabiya barê abûriya xelkî û ew qeyranin ku xelkî bi sedemê şerî an bi sedemê lihevhatinên siyasî ve derbaz dikin.

2.1.7. Ekronîm

Navên naskirî nexasime ewên pêkhênên dirêj hene û ji çend peyvan pêktên bi derbirîna dengê êkê ya peyvên pêkhêner tên kurtkirin, hinek ji peyvan tîp bi tîp tên gotin û hinek din jî ji forma peyvekê tê derbirîn.

“Êk ji rêyên darêtin û çêkirina peyv û zaravan (Ekronîm)e rêyeke cîhanye û dinav piraniya zimanên cîhanî tê dîtin” (Şêrwan Husên Hemed, 2010, 167)

Di zimanê kurdî jî da evê şêwazê kurtkirinê tê pêrewkirin, mîna (Y. N. K= Yekêtî Niştimanî Kurdistan), (P. D. K= Partî Dîmokratî Kurdistan), ji navên biyanî jî navê rêkxrawên cîhanî jî bi gelemperî bi vî şêwazî tên kurtkirin, mîna (UN=United Nations), (UNESCO= Rêkxrawî Zanist û Perwerde û Roşnbîrî ser be Netewe Yekgirtuwekan) (KNN=Kurdish News Network) piraniya caran bi rêya bikarînana navên kûrtkirî, çêdibe temaşevan an guhdar tinê navên kûrtkirî bizane û navê bingehî her nizane: (NATO, AIDS, B.D.P. . .)

Ev şêwaze ji kurtkirinê, gelek ya guncaye ji bo nûçeyên telefizonê, jiber ku dibe sedemê zivrandiana dem û sanahî gehandina navan nexasime navên dirêj.

Nimûne:

“Be gwêrey hewalêkî rojnamey hurîyetî turkî, barzanî bîryare kotayî em mange, serdanî turkya bika, be mebestî beşdarîkirdin le kongrey partî dad û geşepêdan AKP, ke bîryare rojî sî em mange berêwebîçê. Rojnamey hurîyetî turkî le hewalêkda ke dwênê bilawîkirdotewe, partî dad û geşepêdan bo beşdarbuwan le kongrey partekey dawetnamey rewaney jimareyekî zor le serkirde û serokî wilatanî cîhan kirduwe û lew çwarçêweyeşda dawetnameyekî rewaney barzanî kirawe, barzanîş le welamî dawetnamekey partî dad û geşepêdan raygeyanduwe, amadeye beşdarî kongreke bika. Her be gwêrey hewalî rojnameke, bo beşdarbuwanî le kongrey partî dad û geşepêdan be serokayetî receb teyb erdogan, ke bîryare sî em mange le turkya berêwebçê, çendîn dawetname rewaney heryek le barak obama serokî wîlayete yekgirtuwekanî emrîka û encêla mêrkil rawêjkarî elmanya û firanswa oland serokî ferensa û beşêk le serkirdekanî wilatanî yekêti eurupa û vladîmêr potin serokî rusya û seroke nwêyekanî wilatanî erebî û partî komonîstî çîn kirawe” (Malperê N.R.T)

Navê (partî dad û geşepêdan) çar caran hatye dûbare kirin, eve jî di darêtina nûçeyan da neya pesende û bêzarîyê li cem xwandevan çê dike, divya di vêre da piştî cara êkê Ekronîma partî dad û geşepêdan (AKP) hatiba bikarînan.

3. Ristesazî di Nûçeyên Rojnameyên Elektronîk de

Sîntaks an zanstê darêtina ristan, zanisteke ji pêkhênên ristan vekolînê dike. Merem jê diyarkirina şêwazên pêkînan û cihê peyv û erkên wêye, wan saxletan diyar dike ku pêkhênerên wê li wî cihî werdigre, vêca saxletên rêzimanî be an hukmê rêzimanî be ji pêşxistin û paşxistinê da li gor viyan û meremên axaftinkerî.

Astê dengsazî di zimanî da, ku herdû layenên Phonetic û Phonology vedigre amaje bi deng û fonîman dike, astê Morfolojî bi morfîm û peyv, di astê sîntaksê jî da amaje bi firêz û ristan tê kirin, ew kereste çewa di pêkhênên ristê da rêz dibin, biçûk tirîn pêkhênên morfîman girêday peyvên guhertîye û dikeve bi destelata sîntaksêve.

“Sîntaks bi giringtirîn wan saxletan were danan ku zimanekî ji yên din cuda dike, bi renekê sade pêktê ji wan rêyên ku daneyên biçûk pê tê komkirin (mîna peyv) ji bo pêkînana daneyên mezintir (mîna ristan) hemî zimanên miruvatyê şêwazeke sîntaksî heyê” (R.L.Tirsk, 2002, R33)

“Ristesazî hêzê dadîne ser alavên rêzimanî, ku çewa di pirosêsa peywendî girêdan û ji hevdû bikardînin ji bo derbirîna hizrên xwe, çewa peyv pêkve werin girêdan, çewa riste ji wan ra werin dirustkirin” (Ewrehman Hacî Marf, 2005, R780)

Nimûne:

“Kompanyay nokya bo berheme elîktronyekan raygeyand, le çend mangî rabrdû zincîreyek mobaylî berhem hênawe, nîmayşkiriduwe” (Malperê Kurd Yu, 2007)


Hejmara ristan di têkistê nûçey da êksane bi hejmarên kiryanan di têkistê da, piraniya caran di rojnameyên elektronîk da ristên lêkday ya zale bi ser ristên sade û aloz da.

3.1. Cor û Pêkhênên Ristê

Riste mezintirîn û aloztirîn dana rêzimanîye ku ji êk an çend peyvekan (her peyvek nûneratya peyvekê dike) pêktê, ristek bikaribe ji çend peyvên rêkxistî ji bo derbirînekê were pêkhatin.

“Zaravê riste, kerestekê zimanî ya tamam vedigire, ku hemî kertên wî digel hevdû û hemî keresteyên din peywendyeka mikum hebe, di heman dem jî da ji kerestekê mîna xwe hatibe dûrketin” (Mihemed Me’ruf Fetah, 2010, R102) anku formeke xwesere û peywendyên rêZiman bi dervey xwe ve tûneye.

“Le Hewlêr bawkêk be mindalêkî şad debêtewe” (Malperê Kurd Yû, 2017) di rojnameyên elektronîk da ristên sade tinê di manşetanan da tên bikarînan.



3.1.1. Pênasên Ristê

Ebidulla Husên wesa pênasê ristê dike û dibêje: (riste pêktêt ji regê kar û pêdivyên wî)

Pêdivyên wî anku keresteyên wî dû curin:

3.1.1.1. Kereste yên Sereke

Merem ji keresteyên sereke, ew pişkên ristanê ku di pêkhênên hem ristan da pişikdaryê diken û bi gelemperî riste ji aliyê ronaneve dirust nabe. Ew kereste di şiyar da nîne bîn ladan anku xurtîne (Obligatory), jiber ku kar di pêkhênên ristan da dikin. Keresteyên sereke jî li gor karê ristan jî tîn guhertin:

A- eger karê ristê têper bû, wî demî pêdivyên sereke yên ristê pêktên ji (Biker, Berkar, Kar) mîna:

- Azadî kewek girt.

Biker Berkar Kar.

B- eger karê ristê têneper bû, wî demî pêdivyên sereke yên ristê pêktên ji (Biker, Kar) mîna:

“Şoyekî rastewxoy giftûgo amêze, be amadebûnî xelk, kesanî peywendî dar û berpirs bangêşt dekat û le rêy giftûgowe babetî bernameke le mawey (90) deqîqe berê deken” (Malperê Rûdaw, 2017)

Çênabe keresteyên sereke yên vî têkistî bi hêceta kurtbirî werin ladan, jiber ku ladana keresteyên sereke guherînên watayê li pey xwe dîne.

3.1.1.2. Kereste yên Nesereke

Merem ji kerestên nesereke yên ristan, ew beşên ristane ku di pêkhênên tevahiya ristan da pişikdaryê nakin, bê alîkariya keresteyên sereke yên ristê nikarin ristan pêkbînin. Keresteyên nesereke yên ristê di şyan dane bên ladan, jiber ku girdarîn (Optional) û çû bandor li ser pêkhên û çêkirina ristan nakin.

Kereste nesereke jî evene (Diyarkirî, Berkarê nerastewxo, Hevalkarê demî û cihî û çewanî. . .), dibêjne ew kereste yên nesereke (Serbar), ku roleke giring dibîne di berfreh kirina wataya ristan da.

Çalakvanan vîdyoyek di torên civakî da belav kirye, ku xortekê Tirk ji nêzik ke'beyê pîroz daxaza hevjinîkarî ji keçikeke Tirk kirye, xeleka hevjinîyê pêşkêşî wê dike.

Hinek jî bi siruştî ya wergirtî û ya nivîsî *“Ewane le ser sunnehtî xuda û pêxemberekey le malî xuda bew kare hestawn, pîrozyan bê û be pêçewanewe way debînim karêkî başyan kirduwe”* (Malperê Kurdistan24)

Keresteyên sereke yên vî deqekî (xortekê Tirk), (ke'beyê pîroz), (xeleka hevjinîyê) di berhev kirina nûçeyan da keresteyên ne sereke ji bo gehandina meremên bûyerê ji bo xwandevanî tên bikarînan, an ji bo ragirtina hestê xwandevanî mîna peyva (pîroz).

3.1.2. Curên Frêzan

3.1.2.1. Frêza Navî

Ew pişka sereke ya ristê, bi kêmvê ji navekî an cînavekî pêktêt, an kerestekê sereke û kerestek an çend kerestekê nesereke (diyarkeran) pêktêt.

Diyarker jî ji pêş sere an paşî sere yê dikevin. Çêdibe diyarker bi alîkariya morfîmekê an amrazên xistineser an bê amrazên xistineser bi (sere) yê firêza navî ve bîn girêdan.

Ji bilî pişkên din yên axaftinê mîna (Nav - Çawig) dikarin erkên sereke yên firêza navî bînin.

Firêza navî ji aliyê berfreh kirinêve ronaneke bê sînore, jiber ku heta di şyana axaftinkerî da be bikaribe firêza navî berfireh bike, her berfrehkirinek jî di firêzan da bê rûdan pişt bi diyarkeran girê dide, vêca diyarkerek be an zêdetir (Nav) an (Cînav) an (Çawig) dibine sere ya firêzê, diyarker jî pişikdaryê di berfrehkirina firêzê da, dikarin berî sere û piştî serey bihên.

Evên li xwarê diyarkerên sereyne:

3.1.2.1.1. Hevalnavê çewanî

1-Hevalnav firêza navî berfreh dike û dibine diyarkerên paşî serey bi alîkariya morfîma xweser (y, î) eger sereya firêzê di şêwê nasyarî dabe, bi vî şêwey:

F.N Nav + y, î + Hevalnav

2- Di wê doxê da ku keresteyên firêza navî di şêwê nasyarî da be, bi morfîma nasyarî (eke) hatbîte berfreh kirin, ew hevalnav bi alîkariya morfîma (e) yasaya wî bi vî rengî dibe:

F.N Nav + e + Hevalnav

Di darêtina deqên nûçeyan da kêmtir alavên nasyarî bi tinê tîn bikarînan, piraniya caran mîna komê nasyar tê bikarînan *"Emşew milyonan kes le cîhanda runakyekanyan bo mawey katjmêrêk dekujênnewe"* (Malperê N. R. T.)

3.1.2.1.2. Hejmara Pileyî

Hejmarên pleyî firêza navî berfreh dike bi alîkariya morfîma (y, î) yên xistineser, diben diyarkerên paşî serey yê firêza navî, ew yasa bi vî rengî:

F.N Nav + Y + Jimare

Nimûne:

- Qutabîy yekem xelatkira.
- Xanûy duwem malî êmeye.

3.1.2.1.3. Cînavê Kesî yê Xweser

Cînavên xweser di dawiya sereya firêza navî dikare firêzan berfreh bike, bi alîkariya alavên xistineser (y, î) di firêzan de, nav dibe sere û cînavên xweser jî dibine diyarkerên dawiya sereya firêza navî.

F.N: Nav + Y, Î + Cînavê xweser

Cînavên xweser beşdariyeke çalak ya hey di axaftinên rojane da, lê di nivîsînê da nexasime nivîsînên malper û rojnamên elektronîk da çalakiya wan mîna hev tûneye, ji bo nimûne cînavên (Min, Ême) rêjeya bikarînana wan kêmtire ji (Ew, Ewan) çunkî nivîskar nûçeyan bi navê xwe belav nanivîse.

3.1.2.1.4. Çawig

Çawig li dawiya sere yê firêza navî dikare firêzê bike bi alîkariya morfîmên xistineser (y, î) di firêzan da Nav dibe sere û Çawig jî dibe diyarkerê dawiya sere yê firêza navî.

Yasaya wê bi vî rengî ye:

F.N: Nav + Y, Î + Çawig

“Berêweberî rageyandinî wezareî kar û karûbarî komelayetî raygeyand”
(Malperê kurd Yu)

3.1.2.1.5. Cînavê Nîşane

Cînavê nîşane dibe diyarkerê dawiya serey bi alîkariya morfîma xistineser (y, î) yasaya wê bi vî rengî ye:

F.N: Nav + Y, Î + Cînavê nîşane

“Cêgrî serokî lêjney samane sruştiyekan eweşî xsterû” (Malperê Bizav)
bikarînana cînavê nîşane di darêtina deqên nûçey da bi renekê zav digel morfîma lêkder (ş) têt.

3.1.2.1.6. Cînavê Pirs

Cînavê pirs dibe diyarkerê dawiya serey bi alîkariya alavên xistineser (y, î).

Yasaya wî bi vî rengî ye:

F.N: Nav + Y, Î + Cînavê pirs

Nimûne:

- Kê be berpîrs dezanî le brînî mûçey Fermanberan?

3.1.2.2. Frêza Karî

Bi pêkhêneke sereke yê ristê tê naskirin, jiber ku dinav ristan da xurtiye û di şyana da nîne were ladan, ev pişka giring ya ristê, pêdivye mîna: bingehî çespay dinav ristan da bê meyzandin, bi rengê ku we li me dike, em bêjin firêza karî ji curên din yên firêzan giringtîre di biyavê çêkirina ristê da û nemakare wê bihêlin, bi vê girovê ku çêdibe firêzên din mîna (Firêza navî û Firêza benid) yan (Biker û Berkar) di ronana serî ya ristan da dernikevin û bermayên wan dinav firêza karî da bichbimîne û xwandeve an guhdar bi rêya firêza navî ve bigehe ronana binî ya ristê, lê di zimanê kurdî da çî caran riste bê hebûna firêza karî dirust nabe.

3.1.2.3. Hevalkar

Hevalkar bi hemî curên xwe ve (Demî, Cihî, Çewanî, Çendî, Hoyî (Sedemî)...) dikare di berfrehkirina firêza karî pişikdaryê bike, mîna kerestekê nesereke di ristan da derdikeve, jiber ku ladana wî çû watayan ji ristan nagurît.

Nimûne:

- Çêşteke zû kula.

Cihê hevalkarê livoke û çêdibe dinav ristan di demê rêzbûna wan da bi azadî serederî digel wana were kirin û di her cihekî din ya ristê dabe ya guncay be, anku axaftinker gelek caran li gor şengistên alîkarî cihê hevalkaran di guherî.

- Dwênê hîç rûdawêkî hatûço tomarnekra.

Firêza hevalnavî ji aliyê pêkînanêve pir sadeye, nexasime eger digel firêza navî were berawird kirin, çêdibe firêza hevalnavî bi sê rêyan bê berfrehkirin:

- 1- Berfrehkirina firêza hevalnavî ji pêşve.
- 2- Berfrehkirina firêza hevalnavî ji paşve.
- 3- Berfrehkirina firêza hevalnavî ji herdû aliyanve (pêşve, paşve),

Firêza hevalnavî ji paşve, tinê bi alîkariya morfîmên pîla Bala (tirîn) û Berawird (tir) berfireh dibe.

Firêza hevalnavî di pîla berawird da, yasayên wê evene:

- ✓ F. Hevalnavî Hevalnav+ morfîma (tir) ya berawird

Wek:

- Baş + tir = Baştir

Firêza hevalnavî di pîla bala bi vê şeweyê tê dirustkirin:

- ✓ F. Hevalnavî Hevalnav+ morfîma (tirîn) ya berawird

wek:

- Xoş + tirîn = Xoştirîn

“Îvan Rakîtîçî Krwatî û estêrey hêlî nawerastî yaney berşlone beşêweyekî fermî bondekey legel yane ketelonîyeke ta salî (2021) nwê kirdewe. Emeş ciwantirîn wênekanî nwêkiridnewey bondekeye” (Malperê kurd Yu)

3.1.2.4.Frêza Hevalkarî

Merem ji hevalkarê ewe ku divêt bi kêmîve kerteka (sere) hevalkar be, firêza hevalkarî jî ji bilî wan hevalkarên tekûtok û bi amade kirî hene dinav pişkên axaftinê, ku tiblên destan dê hejmartin, ewên din hatîne dirustkirin.

“Mêjûy rojî dayk le wilatêkewe bo wilatêkî tir degorêt, bo nimûne le wilatanî rojhelatî nawerastda rojî dayk dekewête 21î azarewe, belam le wilatêkî wek neruyc da dekewête 2y şubatewe, le wilatî ercentîn dekewête 3y tişrînî yekemewe û le başûrî eferîqada dekewête 1î ayarewe, belam le wîlayete yekgirtuwekanî emrîka da em roje dekewête duwem yek şemmey mangî ayar le hemû salêkda” (Malperê N.R.T)

Cih û demê rûdana her nûçekê giringîya xwe heye li hember girngya wî nûçey, heta demê pexşkirina wî nêzîktir be bi bandor tire, anku bikarînan hevalkarê (niho) ji hevalkarê (dîhî) giringtire.

3.1.2.5.Frêza Bend

Merem ji firêza bend ewe ku bi alîkariya êk ji amrazên pêwendî (le, be, bo) dirust dibe, anku demê ku ev alave diçin ser (Navekê, Firêzeka navî, Cînavekê xweser) firêzeka bend dirust dikin.

Alavên firêza bend ji dû curan pêktêt:

1- Ewên êk morfîmin û ji pêşiya peyvên watadar tîn, dibêjnê (alavên bend).

Mîna: (le, be, bo)

2- Ew alavên ji morfîmekê zêdetir pêktên û dikevîne pêş û dawîya peyvên watadar, dibêjnê (alavên bendên kertî)

Mîna: (le. ewe), (le. da), (le. ra)

“Em naweş lelayan serokî wîlayete yekgirtuwekanî Emrîkawe (Undrown Wilson) em nawnaney bekarhêna le yasada wek cejnêkî fermî le wîlayete yekgirtuwekanî emrîka, herweha kongrêsi emrîkî le bunyadnanî yasayîda bekarîhêna

û hendêk serokî tirîş amajeyan bo kiribû le bangeşekanyan da bewey ke rojî dayk giringîyekî taybetî heye”(Malperê N.R.T.)

Firêza bend pişkdariyeka çalak di darêtina nûçeyên malper û rojnamên elektronîk da ya heyê, jiber ku zêdetirîn peyvên têkistên nûçeyan navin û navan jî bi alîkariya alavên bend dirust dikin.

3.1.3. Curên Bikeran

Di zimanê kurdî da 5 cur biker hene:

3.1.3.1.Bikerê RêZimanî

Bi wan bikeran tê gotin ku ji aliyê rêzimanî ve bikerin, wata bikerê rastiya ristan nînin, belkî tinê cihê bikerê di ristan da tijî dikin.

Ji bo nimûne:

- Pencer hate şikandin.

3.1.3.2.Bikerê Lojîkî

Bi wan bikeran tê gotin ku ji aliyê watayê ve erkê bikerî cîbicî dikin, anku bikerê rastiya wê kariye, evan curên bikeran hinek caran ji cihê asayya xwe tîn.

Mîna:

“Kosret bayz yarîzanî yaney şurtey êraqî befermî daway lêburdnî le îdarey ew tîpe kirid”(Malperê Kurd Yu)

Kosret êkser danpêdanan bi tawanên xwe kirye, bi xwe biryar da daxaza lêbûrînê bike.

Lê hinek caran ji cihê bikerê asayî nahên, ji bo zelalkirina zêdetir temaşeya vê ristê bike:

- Aheng dengî Rizgar debîstê.

Di vê ristê da eger (Biker) û (Berkar) bîn destnîşankirin, bê berçav wergirtina aliyê wataya ristê, wî demî (Aheng) bikerê risteye û (Rizgar) berkare, lê eger ji aliyê watayê ve ji bo ristê biçin, wî demî (Rizgar) bikere û (Aheng) jî berkare, jiber ku (Rizgar) diaxive û kar ji (ahenge) dike û we lédike dengê wî bi bihîste.

3.1.3.3.Biker Diyar

Bi wan bikeran tê gotin ku di ristan da xweser derdikevin, anku ew kesê wî karî encam dide, bi eşkere derdikeve. Mîna:

- Mindaleke sêwekey xward.

“Bernamey bekurdî dûbare 14: 30 debêtewe” (Malperê Kurdistan 24)

Piraniya nûçeyên malper û rojnameyên elektronîk bi vî şêwazîn.

3.1.3.4. Biker Nediya

Bi wan bikeran tê gotin ku di ristan da diyar nabin, jiber sedemek ji sedeman dinav ristê da hatye ladan. Mîna *“Yarîzanêkî êraqî be baştrîn yarîzanî asya destnîşan kirawe”* (Malperê kurd Yû)

Bikarînana riste yê neyê diyar di têkistên nûçey da jo bo giringîdan û mezin kirina nûçey vedigere, jiber ku bi danana kesekî di vî nûçey da ew nûçe biçûk dibe.

3.1.3.5. Biker Nediya Amaje Pêkirî

Herwekî tê zanîn keresteyên biker neyê diyar ewin ku bikerê wî dinav ristan da nehête derketin, lê di zimanê kudî da hinek halet yê hene, ku bi rêya wesfî sîntaksî bikerê wî tê berçavan. Anku di cihekî din yê nav ristê hest bi hebûna Bikerî tê kirin. Di vêreda hinek ji wan yasayan tînin berçavan:

Bi egerê pêşbendan ve (be, le, bo, pê...) ji wan nûçeyên ku encamderên wan kiryanan dêxne ser hinek aliyê û kesan tînin bikarînan.

Mîna:

- Awarekan be pas gwazranewe.

3.1.4. Berkar

Dû curên sereke yê hene:

3.1.4.1. Berkarê Rastewxwe

Kerestekê serekîye ku wataya karî tamam dike, mîna firêzeka navî (sade, berfreh kirî, lêkday) digel karên têper bê alavên peywendî tê bikarînan û êkser li bin destelat û bandorên karê ristê daye û karî berfireh dike, bersiva pirsyarekê (kî, çi) dide. Mîna nimûnên li xwarê:

3.1.4.1.1. Frêza Navî ya Sade ya Nawik

“Gamêş le herêmi Kurdistan ta astêki metrsîdar kemîkrîdûwe ta dêt jimarey ew ajele kem dekat” (Malperê Kurdistan24)

3.1.4.1.2. Frêza Navî ya Sade ya Berfreh kirî

“Wek keşnasî herêmi barî keşuheway emro û sibeynêy rageyand ke asman hewr û baranawî debêt” (Malperê N. R. T.)

Di berhev kirina nûçeyên seqayê da modêl û hunerên kesayetiyan bi rengekê zav tê bikarînan.

3.1.4.1.3. Frêza Navî ya Lêkday

- Nusereke honrawe û wîtarekanî blawkirdewe.

- Bi gelemperî di zimanê kurdî da ew keresteyên mîna firêza navî erkê berkarî dibîne, pêktên ji:

-Nav, Cînavên xweser (pirs, nîşane, nediyar, xoyî, kesî xweser), Cînavên likawên xawenyetî û rêkeftin, Çawig, Hevalnavên çewanî, Hevalnavên biker, Hevalnavên kiraw.

“Bnarî kosret, yekêk le şwêne dilrîfînekanî başûrî Kurdistan û zorbey gund û şaroçkekanî le lêwarî deryaçey dukanî snûrî parêzgay silêmanîyewe nîke” (Malperê Rûdaw)

3.1.4.2. Berkarî Nerastewxwe (Tewawkerî bi Yarîde)

Kerestek neserkye û wataya kiryanan temam dike û di ristan da ji şewê firêza navî (sade, berfrehkirî, lêkday) bi alîkariya êk ji wan amrazên peywendî (be, le, bo, be...da, le...ewe, le...da...) digel têper û teneper derdikeve, nerastewxo dikeve bin bandorê wê karî û di ristê da wê karî berfreh dike û bersiva pirsyanan dide ku (bi kî, bi çi) bête kirin, mîna van nimûnên li xwarê *“Bo yekem car le naw cergey lenden le şeqamî oxford super markêtekî benawbangî berîtanî cil û bergî afretanî muslman defroşêt”* (Malperê Bizav)

3.1.5. Serbar

Serbar kerestekê neserkye, çêdibe bête ladan bê ku watay wê ristê xirab be, erkê diyarkerê karî dibîne, cihekî diyarîkirî nîne di ristê da.

- Serbar bi rêya çi curekê ji firêzan tê dîtin?

“Daykan û Bawkan hemîşe tirsyan lewe heye mindalekanyan lerêy tore komelayetyekanewe zyanyan pê bigat û temaşay babetêk biken lerêy enternêtewe ke zyan be reftaryan bigeyenêt çunke lenaw programekanî enternêtda ştanêk hen ke legel temenî mindalda guncaw nîn û nabêt seyryan biken” (Malperê Xêzan)

Serbar mîna kerestekê nesereke rola giring dibîne di zanyarî pêdana xwandevarên malper û rojnamên elektronîk, lê di piraniya nûçeyan serbarên ne pêdivî tên danan, eve jî ji egerê kêmya ezmûna nivîsînên û bêhêzî ji darêtinên nivîsînê da.

3.1.6. Temamker

Kerestekê sereke an neserekye di ristan da? Ladana wê dibe egerê nerêzimanî bûna ristê? Cihêkî diyarî kirî heye di ristê da? Dibe tamamkerê çi curên karan? Ew kereste çine dibine tamamker?

Nimûne:

“Waz le heb bhêne mozêk bixoy çunke vîtamîn (B) têdaye debête hoy rêkxistinî rêjey glokoz le xwênda û debête hoy kemkiridnewey bêtaqetî” (Malperê Baxçe)

Ji aliyê wata an naverokê ve, riste ji (wataya peyv an û bandorên rêzimanî) pêktêt, jiber hindê riste dû watayan dibexşe, ku ferhengî û rêzimanîne û erkên zimanî cîbicî dikin, erkên ristê bi gelemperî pêktên ji:

3.1.6.1.Nûçe Gehandin

Di vî curê ristê da, axaftinker ji durmandora xwe û diyardan daxive, ku çêdibe nûçeyên rast anku xelet bin, hêz bi ser tevahiya ristan da dabeş dibe û di dawî da tête xwarê. Di ristên nûçeyan da şyana guherîna cihên peyv û kerestan hene, bê xirab bûna wataya ristê û li gor wê meremên ku axaftinkerî ya hey.

- Be hoy zyadbûnî qurbanyanî medenyewe oprasyonî rizgarkiridnî Musl ragîra.

3.1.6.2.Ristên Pirs

Ev cur riste, bi gelemperî bi merema dest ketina pêzanînan were bikarînan, axaftinker ji rêya pirsyan ra li dîv zanyariyan digeryêt, ji destpêka bernameyan tên bikarînan.

- Kê berpirse le nizim bûnewey astî xwêndin?

- Çî bikrêta astî zanstî zankokan berz bikrêtewe?

3.1.6.3. Ristên Daxazî

Di vê curê ristê da, axaftinker daxaza cîbicîkirina karekî ji guhdarî dike, ji rêya daxazî an fermanan ve.

Zêdetir daxazya welatyan dibe ristên daxazî:

- Rêgaûbanman bo qîrtaw biken.
- Nexoşxaneman bo dabîn biken.

3.1.6.4. Ristên Mendehoşyê

Di ristên mendehoşyê da, axaftinker hestê xwe derdibre ji bo durmandora xwe, ku curek ji mandehoşî têda be.

3.1.6.5. Riste ji Layê Ronanêve

Ji aliyê ronanêve, herçende riste formeke azade û nepişkeke ji formên ji xwe mezintir, lê nemerce herdem di formên ristên sade da bê dîtin, jiber hindê eger sade be an nesade her formeke xwesere, şengistên cudakirina ristên sade û nesade, pêktêt ji hebûna hejmara kiryanan, anku li gor hebûna kiryanan curên ronana ristan tên diyarkirin, bi gelemperî dabeş dibin ser van curan:

3.1.6.5.1. Ristên Sade

Ew risteye ku xweser watayeka temam hebe û pêdivî bi risteyên din nebe, tinê êk kar jî heye.

3.1.6.5.2. Ristên Aloz

Bi wan ristan tê gotin ku ji ristikê sereke û ristikê dawî da hatî an zêdetir pêktêt “Zêdan legel destey kargêrî yanekey hîç giftûgoyekî nekiriduwe derbarey dahatûy yarîzanî kolombî Xamîs Rodrîz, taweku dahatûy Bogba legel yaney mêrengî nadyar nebêt û girêbest legel yarîzanî ferensî îmza biken” (Malperê kurd Yû)

Ristên aloz bi alîkariya alavên gehandinê (rgîna, ta, hetaku, daku, ke, ku...) ristên mercî dinav têkistê nûçeyan da dirust dikin.

3.1.6.5.3. Ristên Lêkday

Ew risteye ku ji dû ristên sade an zêdetir pêktêt, her êk ji wan ristan karekê hey mîna formeke xweser ku tinê peywendyeka watayî wana kom dike û her êk ji wana watayeka xweser ya xwe heye.

“Wêray destpêkrdnî werzî behar û berz bûnewey plekanî germa, keçî le hendêk şar û şaroçkey bakûrî Kurdistan keşuhewa berew sardîy ziyatir deçêt û le colemêrgî bakûrî Kurdistan çwar metir befir kelekebwue” (Malperê Rûdaw)

Ji bilî navnîşanê çî nûçeyek nabe ristê sade be, jiber hindê ristên lêkday bi alîkariya amrazên lêkder (û) an (coma) an (lê)... pişkdariyeka çalak di nûçeyên zimanê kurdî da hene.

3.1.6.5.3.1. Ristên Sereke

Risteyekê xwesere di ristên têkel da morfîma peywendî pêşnakeve.

3.1.6.5.4. Ristên Şûnkeftî

“Ew risteye ku di ristên têkel da dîv ristên sereke dikeve, nek ji dawiya wî bihêt, jiber ku li gor pêdivyên wan ew dû riste paş û pêş dikevin” (Nesrîn Fexrî, 2002, R22)

Riste ji peyv û firêz (phrase) û lariste pêktêt, daneya sereke ya sîntaksê peyve *“Firêz mîna yekeyeka zimanî –ketîgorî ya peyvan- ji aliyê ronaneve ji ristan biçûktire jiber ku cihê ronaneke bilind tir ji peyvan digre bi vê çendê jî firêz pêkhêneke navendye û dikeve navbera peyv û ristê ve”* (Behar Zahir Mihemmed, 2009, R57) mîna danekê rêzimanî, derbirînên rêzimanî hebe û ji cihekî di ya ristê mîna danekê din were bikarînan.

Riste ji çend beşên bingehî pêktêt her danekê rêzimanî bikaribe rolê pişkeke bingehî bigêre, firêzekê tîne. Sade tirî riste ji dû ristan pêktêt:

- Firêza navî.
- Firêza karî.

“Sadetirîn firêza navî ji navek an cînavekî pêk têt, sadetirîn firêza karî jî ji regê kar û cînavekî pêktêt, erke wî cînavî derbirîna rêkeftinêye di navbera biker û karî da” (Wrya Umer Emîn, 2009, R199)

Nimûne:

- Çalak hat.

Di vêreda (çalak) firêzeka navye û (hat) jî firêzeka karîye.

“(Çalz Firêz) di pênasî ristê da dibêje: êk gotinê xwesere biçûk tirîn an gotineke mezin kirî, merem ji (xweserî) ewe ku ew gotin rûnedabe bi kertê ronana ji xwe mezintir ji aliyê ronaneve” (Mihemmed Me’ruf Fetah, 2010, R.217)

“Demê ku behsa ristê tê kirin, pêdivyê mîna pêkhêneke behs ji morfîmên peyv guher bête kirin, evan morfîman wataya xweser tûneye, lê hilgirê watayanin û dibêjnê morfîmên rêzimanî erkê guherîna barê rêzimanî dibînin, anku ev morfîme naguherin belkî erkên wan erkê rêzimanî (Morfîma peyv guher diyardeka Morfolojî-Sîntaksyê pestê şewazên peyvyan dike, bi merema diyarkirina barekê rêzimanî, bê ku wataya peyvê an polê peyvyan biguhere” (Ebubekir Umer Qadir, 2003, R14-23) ji bo nimûne “ji navan re ket û kom dêxne ber çavan an nasyar û nenasyarî dikin” (Ebubekir Umer Qadir, 2003, R14-23)

Riste bê morfîmên peyvyan çênabe, guhertin çênabe ji bo nimûne:

- Min deçm bo Bazar.

Her êk ji (de, m) morfîmên peyv guherin, bi ladana wan ew riste çî watayek nabe, jiber ku ewan valahîyan tijî dikin ku di ristan da dikevîne dinavbera peyvên ferhengî ve û wataya wan pişkeke ji wataya gelemperî ya ristê û dibêjnê morfosîntaks. “Morfîm mîna yekeyeka pêkhênên ristê, erkek, watayek, meremek digehîne” (Ebubekir Umer Qadir, 2003, R14-23)

Derbarê bi rêzbûna keresteyên zimanî, ji hemû zimanan da ji bilî çenid egeran derbaz nabe ku pêktên ji çewanya li dîv hevdû hatina (Biker, Berkar, Kar) di pêkhênên ristê da.

Rênmayî yên Nivîsîn ji Bo Malperên Elektronîk

Rojnamevanî

Nivîsîn ji bo malperên elektronîk cudaye ji nivîsîn ji bo rojnameyên çapkirî, an ji bo xwandin ji rêya êkranên teleffizonê û belavokên radyoyan, her êk ji wan amrazan pêdivî şewazeke nivîsandineke taybet heye, mixabin dinav mêdyayên kudî de ev cudahî nahêne berçav wergirtin.

Wesa diyar dibe bikarhînerên înternêtê gelekî bilezin û ew ji rûpelên malperekê dimeyzînin ku wan nûçeyên ewî divêt têda nebin, an sernca wî ji bo tiştêk din nehête rakêşan û bilez nebîne: helbet wî malperê dihêle û berev êka di diçe.

Di encam da divêt wî tiştî bizanibe û bigehe wî, jiber hindê divêt tû di êkem nûçe da bêjiye wî û wî bigrî.

Tu hizra xwe bike bizanibe çewa dikarî dinav van hemî têkilî û alozyê evro di dunyayê da heyê bikarî çîrokekê ji bona wî çêkey, tu bikarî ji rêya bikarîna çenid ristekê bigehye xwandeveanên xwe.

Herwesa çewa mifa ji wan ristan dibînî ku pêdivîne? Helbet ev riste jî di peregrafê êkê da hene.

Navnîşaneka Baş

Helbet xwandevean ji bo wergirtina nûçe û pêzanînan di beşê sereke ya wê malperê serdana nûçekê dike ew jî bi rêya navnîşana ve.

Lewma tinê navnîşaneka bihêz û balkêş dire pêzanînan bidet. Xwandevean nevêt li ser navnîşana bê xapandin, an direwa lê bikin, an navnîşan û naverokê babetan ji hevdû dûr bin û tinê ji bo vekirina malper û xapandina wî be, bi vî rengî xwandeveanan ji dest didî.

Nûçeyan zindî bike

Di şyan daye bi bihêz kirin û balkêş kirin û zindî kirina babetan mifa ji jêder û wêneyên ragehandinên din bê dîtin. Eve jî di nivîsîna de ne egereke dûre.

Pêdivye ji bilî nûçeyan xwandeveanan jî zindî bikin û êk ji baştirîn rêyên vî karî vêdana soz ye ji veguhastina nûçeyan bi rengê rast û dirust.

Ji rêya veguhastina bûyer û pêşhatên balkêş bitaybet ewên pêwendîdar bi bûyeran bikaribe vê cansê ji bo xwe mifayê jê werbigre û pêkve girêdana van beşên ku xwandeveanî divêt, tû zîrek be û ji wana netirse, jiber ku ew şengist û nûçe û darêtinên ku tu dizanî xwandeveanî hay jê nîne.

Dûbare Nivîsandin

Armanca me dirustkirin an danana peywendyane digel xelkî û gehandin û zelalkirina merema me bi sanahî tirîn û baştirîn şêwaz. Jibîr neken her paragrafekê çenid carekê bixwînin û binivîsin. Helbet ev şêwaz karê me çêtir dike. Pêşbîniya wê çenidê neke ku yasayên rêzimanî û zimanvanî bêyî destkarî û ji xwe re berî belav bûna wan baş bin an bîn ser rastkirin. Dibêtf em bi van şaşyan nakin ku me nevêt bîn rojevê. Bi egerê mjûlî û pir şulî û tirs ji gîro bûna nûçeyan û ..., lê xwandevean kesekê gelek nerme û dikare baş van şaşyan pêbihese, jiber ku çû givaştinên hevaliy li ser wî tûneye, an dibêtf ji baştirîn demê tenahiya xwe bixwîne.

Şewazên Darêtina Nûçeyan

Çêdibe hûn bi navnîşana nivîserekê derbarê darêtin û nivîsîna babetekê biryara xwe bidin. Tû dibêtî babetekê pir balkêş amade kiribe bê ku pê bihese, lê eger tinê têkistekê sar û hişk bê pêzanîn û dûr ji viyana xwandevanî bikeve dinav malperê da xwandevan naxuyne neyê naçare demê pêve borîne. Jiber hindê xwandevan tê peydakirin ji xwe ra peyda nabe.

Divêt tu hizrê di vê çendê de bikî ku wêne û zelalkirina teknîkî û grafîk û xişta datayan, ev hemî ji bo xemilandin û girngya nûçeyan gelek bi mifane, bandoreke mezin jî hene û herdem pêkulyê bike zêdetir ji vana mifa werbigre, jiber ku wêne dilê hemyane.

Kurt Nivîsîn

Li ser me pêdivye nûçeyên xwe bi kurtî binivîsin, jiber ku xwandin li ser malper û êkranên mobaylan girantir ji kaxezan. Neyê giringe di nivîsîna piraniya nûçeyan hizra xwe di mêjûyê de bikin, eger te zanî xwandevan pêdivî pêşîneya pêzanîname, dikarî ew nûçeyên berî hingî li gor vî babetî te belavkirin, mîna lînkekê hevpeç ji bo wê nûçeyê zêde bikî, an jî mîna nûçeyekê girêday ji bo wergiran destnîşan bikî.

Ragehandîna din

Gelo nivîsandina hezaran peyv li gor êk nûçeyê eve baştirîn rûyê vê nûçe nîşan dide?

Çêdibe wêne, video, deng ku pêwendîdarin bi nûçeyan, gelek caran zêdetir ji têkistên wê nûçeyê pêzanînan digehînin, harîkareke başe ji bo gîro kirina wergirî ji hember hinek xalên lawaz yê nûçeyan, an kême û kasyên ku me li serî amaje pêda.

Eger babetekê mirov bire dinav xeyalan de, renga pêdivî wê çendê be ku hinek silayd û kilîpên deng an reng digel bê danan, daku xwandevan bikeve kûratyê. Eve êke ji baştirîn û giringtirîn xalên nivîsîna nûçeyan ji nav înternête, dibêjnê şyana çend kenalekan ji bo zelalkirin û pênasekirina êk nûçeyê.

Hûrbînî û Şirovekirin

Eger em ji nivîsîna nûçeyên malperê BBC an malperên din bimeyzin, nûçe û bûyerên nû bimeyzîne. Li gor nerînên hewe kîjan gelek baş û balkêşe, bîne berçavên xwe û hokarên başî û girngya wê bixe ber çavên xwe û şirove û hûrbînî ya baş ji bona wana bike. Ji wan tiştên xwandevan dimeyzine wan malperan û cihê

serincrakêşana xelkê bûye û têbîniya xwe li ser wana binivîsin daku baştir mifayê bigehîne we. Amarên gelek baş li gor başî û xirabîya nûçeyan dibîstin û dixwînin, tu jî dikarî derseka baş ji wan curên nûçeyan werbigrî ji bo nivîsînên xwe yê dahatî.



ENCAM

- Malper û rojnameyên elektronîk mîna êk ji bi bandortirîn û belavtirîn alavên ragehandinê, biyaveke ziman dikare têda perwerde be, bandoreke herî mezin yê hey li ser pexşkirina şarezayî ya zimanvanî lewma divêt li gor yasayên rêzimanî bikar bihêt û keresteyên zimanî bi rengekê guncay û naskirî derbikevin, jiber ku her ladan û şaşî bikarînanek rengvedanê li ser wergirên wî dibe û dawî car mîna şaşyên naskirî belav dibin û tên bikarînan, jiber ku pêwendiya dinavbera ziman û ragehandinê bi hêleke terîb naçe nemerce herdû aliy bi heman pile bandorê li hevdû bikin. Ragehandin alyê bihêze jiber hindê bandorên ragehandina rojname û malperên elektronîk li ser zimanî di asteke bilind daye, ev erke jî dikeve ser milê rojnamevanan. Gelek caran rojnamenivîs mîna pêdivî kar bi şengistên zimanî nakin belkî bi viyan û heza xwe zimanî bikardînin, bi vê çendê jî rû bi rûya ladan ji yasayên zimanî dibe.
- Ziman di rojnameyên elektronîk de berev kurtbirî di darêtinên deqan de pêngavan davêjin jiber ku malperên elektronîk negehîte deqên dirêj û hez pê nake.
- Roj bo rojê xwandevanên rojnameyên elektronîk berev zêdebûnê diçe ji hember rojnameyê çapkirî jiber ku malperên nûçeyan dinav torên civakî yên înternêtê rûpelên taybet bi xwe hene.
- Jiblî wêne û têkistan, video jî rûyekî din ya rojnameyên elektronîke.
- Gehandina nûçeyan di rojnameyên elektronîk de ya bileze, hinek caran jî bi rengekê êkser dibe, eve jî dibe egerê dûrketin ji zimanê standard, lê di rojnameyên çapkirî de şaşyên zimanî zêde dibin.
- Bikarînana zimanî di rojnameyên elektronîk mîna amrazeka xapandina xwandevanî bi eşkera dinav nûçeyan de tê dîtin, eve jî diçe çarçuvê neproşnalîya karê rojnamevanîyê kurdî ve û ew azadiya berçav ku dinav torên civakî de hene di belavkirina pêzanîn û nûçeyan bûye hokarê niqirandinî û şikbarî ji rastyê. Peyama rojnamegerîya pirofîşnalî ku karê wê gehandina pêzanînyê ji bo xwandevanî bi rengekî rast bêjî, lê pişkek ji pêgehên nûçey tinê ji pêxemet zêdekirina like û comment xwandevanî serda dibin, ev çende jî bi rêya danana navnîşaneka balkêş mîna:

“Heyfa Wehbî şî bi zelamekê pîr dike” (Malperê Meykewe)

Demê ku mirov vî nûçey dimeyzine dibêje: dinav filmekê de Heyfa Wehbî şî bi zelamekê pîr dike.

- Arîşên sîntaksî neyê dirustê watayê dîne rojevê, ev çende jî vedigere ji bo komeka egeran, mîna nehaydar bûna wan ji pêkhênên sîntaksî yên zimanê kurdî û neşarezaya wan ji çewanya rêzbûna keresteyên ziman di hevok û têkistên kurdî de.
- Lezîkirin ji danan nûçeyan û gehandina wî bi xwandevanî di kêmtirîn demda.
- Gelek caran kêmya şyana wergêran di wergêrana têkistan de ji zimanê êkê ji bo zimana dwê bi vê rengî ku di peyca Rûdaw Sport tê dîtin: rojnama bêld (wîlî sanyol kaptinî pêşûy bayrin mwîwşin buwe karloensylofî rahênerî yaneke) (Rûdaw Sport)

ÇAVKANÎ

Azad Remezan 'Elî (2005), *Binema Zaminîekanî Darştnî Hewal Le Rojname Kurdyekanda*, Dezgay Aras.

Ehmd Mihemmed Elm'qtuq (1996) Elhsîle Elelxuye, *Sîlsîle Ktîb Seqafye Ş'rye Yesderha elmeclîs Elwetenî Lilseqafe we elfinun we Eledeb* –Kweyt .

Eurehmanî Hacî Marf (1979) *RêZimanî Kurdî Bergî Yekem – Morfolojî*, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd Êraq – Bexdad

Ebubkr 'Umer Qadir, (2003) *Berawrdêkî Morfonasîntaksî Le Nêwan Zimanî Kurdî û Farsî da*, Namey Dkora, Kolêjî Ziman – Zankoy Slêmanî.Silêmanî.

Elbêrt Histir Way Lan C. Tu, (2007) *Raberî Rojname Nûs Le Cîhanî Sêyemda, Wegêranî Hessen 'Bdulkerîm*, Dezgay Mukryanî –Hewlîr

Behar Zayr Mihemmed (2009), *Ziman û Yasa Komelayetyekan, Namey Master Le Zimanî Kurdî*, Kolêjî Ziman – Beşî Kurdî Zankoy Selaheddîn . Hewlêr .

Çolî Es'ed Crad , (2013), *Ziman Le Rageyandinî Bînrawda*, Namey Master – Zankoy Slêmanî.

Taban Mihemmed Seyd Hessen (2008), *Geşesendin û Pukanewey Gencîney Wşe Le Zimanî Kurdî Da*, Namey Master – Zankoy Slêmanî.Silêmanî

T. Y. Hardînx, (2006), *Elkitabe Elîza'ye, Ter: Edîb Xzur*, Dîmeşq.

Can Cibran Kirm, (1986) *Medxel Îla Lixe Elî'lam, Dar cebel Eltebi'e Elsanye*, Beirut Libnan.

Cun Bîro, (2001), *Ellisanyat, Ter: Elhewas Mes'udî û Mifath Bin 'Erus*, Dar Elafaq.

Cun R . Bîtnîr, (1986), *Miqedîme Fî Elatsal Elcemahîrî Merkez Elkitab Elerdenî . Hatm Salh Alzamin, (1989), 'Lm Alxe Tb' Bmtabq Alt'lîm Alalî Bamusl .*

Derun Ebdwalremhan Salih, (2010), *Îkonomî Le Astekanî Zimanî Kurdî Da*, Namey Master, Le Zimanî Kurdî –Zankoy Slêmanî.Silêmanî .

Rehîm Surçî, (2008), *Prosey Peywendîy Cemawerî*, Çapî Yekem, Çapxaney Xanî, Dihok.

R. L. Trask, (2002), *Esasyat Ellixe, Ter: Ranya Îbrahîm Yusf, Elteb'e Elula*, Elmeclîs Ele'la Lîseqafe, Elqahre.

Samî Zubyan, (2008), *Rojname Nûsî Rojane û Rageyandin*, Wergêranî Mem Burhan Qan'.

Samî Şerîf Elşerîf û Eymen Mensur Nîda, (2004), *Elluxe ElÎ'lamye, Merkez Cam'e Elqahre Lîlte'lîm Elmeftuh*. Camîhe Qahîre .Misir

Sîd Mihemmed Else'îd(1988) *Întac Elexbar Fî Radyo we Eltelefzyon, 'Alem Ektub, Elteb'e Elula*, Elqahîre .

Şîlan 'Umer Hussên, (2009), *Îdyom-Çeşin û Pêkhatekanî Le Zimanî Kurdî Da*, Melbendî Kurdolojî, Slêmanî.

Şîrwan Hussên Hemed, (2010), *Têrwanînekî Nwê Bo Sînonîm Le Zimanî Kurdî Da*, Namey Master Le Zimanî Kurdî, Zankoy Slîmanî .

'Ebdul'ezîz Şerîf, (1987), *Fen Eltehrîr ElÎ'lamî, Mitabiq Elheye Elmisrye Lîlkîtab*. Misir

'Ebdulstar Cewad, (1998), *Ellixe ElÎ'lamye, Dar Elhelal Lîlterceme, Elteb'e Elula*, Erbid –Elurdun.

'Elî Nasir Knate (2009) *Elluxe û 'Elayqîha, Menşurat Elcemîl, Elteb'e Elula*, Beyrut, Libnan.

'Ebdullah Hussên Resul, (2013), *Puxteyekî Wirdî Ristesazî*, Çapxaney Dezgay Aras, Hewlêr.

Îmad Hessen Mikawî û 'Atf 'Edilî El'ebid, (2006), *Nezeryat ElÎ'lam, I.S.B.N.*

Faruq 'Umer Sidîq, (2011), *Le Dayk Bûnî Wişe*, Çapxaney Şivan, Slêmanî, Çapî Yekem.

Fluryan Kulmas, (2009), *Elluxe Welîqtsad, Ter: Mihmmmed 'Uz, 'Alem Elme'rfe*, Elkweyt.

Ferhad Şakelî, (2011), *Zimanî Kurdî Le Astaney Serdemêkî Tazeda*, Dezgay Aras, Çapî Duwem Hewlêr.

Karulîn Dyana Luys, (1993), *Eltexye Elîxbarye Lîltelefzîwn, Elmektebe Elekadîmye*, Elqahre.

Mihemmed Casim Felhî Elmusa, (2006), *Nezeryat Elîtsal we Elî'lam Elcemahîrî*, Miqerir Merhele Elmacistêr, ElEkadîmye El'erebye Elmeftuhe Fî Eldanîmark.

Mihemmed Cemîl Şeş (1986), *Elilxe Wsayl Elî'lam Elcemahîrye, Dara Elşûn El'ame*, Wezare Elseqafe Fen we Elî'lam, Bexdad .

Mehmud Elsi'ran, (2008), *Îlam Elluxe, Dar Elnehze El'erebye*, Beyrut, Libnan.

Mehmud Fehmî Hicazî, (1997), *Medxel Îla 'Îlim Elluxe, Dar Qeba lîlteba'e we Elneşir*, Misir.

Melfil Minteşir, (2008), *Tehrîr Elîxbar Fî Eleshafe Elîza'e We Eltelefzyon*, Ter: Edîb Xizur, Elteb' Elsanye, Dîmeşiq.

Mihemmed Me'ruf Fetah, (2010), *Lêkolînewe Zimanyekan*, Dezgay Mukryanî, Hewlêr.

Malperê N.R.T.

Malperê Bizav.

Malperê Xêzan.

Malperê Baxçe.

Malperê Kurdistan 24.

Malperê Spêde.

Malperê G. Kurdistan.

Malperê KNN.

Malperê Rûdaw.

Malperê Xendan.

Malperê VOA.

Malperê Kurd Yû

Malperê Rojnamewan.

Nebîl Hêdad, (2002), *Fî Elkîtabe Elsefye*, Dar Kenedî, Erbd – 'Uman .

Nesrîn Fexrî

Hêmin Mecîd Hessen, (2008), *Wesayl Elîtsal Elcemahîrî Fî Îqlîm Kurdistan we Dewriha Fî Teşkil Elrey El'Am*, Rîsale Elmacîstêr Fî Elî'lam, Camî'e Elsuleymanye.

Hana Çomanî, *Maserî Rojnamewanî*, 2014.

Wirya 'Umer Emîn, (2009) *Asoyekî Trî Zimanewanî*, Bergî Yekem , Dezgay Aras, Hewlêr

Wêdows, (2008), *Seretayek Bo Zimanewanî*, Wergêranî Hoşeng Faruq Çapî Yekem, Dezgay Aras .

JİYANNME**Zaniyaryên vekolerî:**

Nav û paşnav: SAMAD OTHMAN QADER

Hewlêr û cihê ji dayikbûnê:

1-7-1982, Bajarê Hewlêrê , Kurdistan.

G-Mail: samadothman2003@gmail .com

Qonaxên Perwerdê: rêveberîya xwendina bilind

Xwendina xwendîngehê hemû li Bajêrê Hewlêrê qedandiye.

Xwendina Lîsansê li zanîngeha Sellaheddîn beşa ziman û wêjeyê kurdî xilaskiriye.

Xwendina Lîsansa bilind li başa ziman û wêjeyê kurdî sala 2017 li zanîngeha yuzûncû yîlê – wan – turkiya dixwênê.